Karkerên hemû welatan û gelên bındest, yekbın!

# riya azadi

Hejmara 30
bo sala 10

Organa Komita Merkezi ya Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê




www.arsivakurdi.org

# PARTİ ÇEKÊ GEL E, HÊVİYA GEL E, DUWEROJÊ GEL E

# Dı Riya Hêzên Dêmoqratik û Dij–İmperyaliyê da Gaveke Gıring

# YEKITİYA ÇEP

*6 Partiyên çep jı Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê dı meha Çıriya Pêşin da (desembır) cıvinek pêk anin û dı nav xwe da bı navê "Yekıtiya Çep a Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê" (Bı navê kurti YEKITİYA ÇEP) hevkariyek sazkırın. Dı nav van partiyan da bona yekıtiya hêzên dêmoqrat û pêşverû diji faşi û imperyaliyê jı çend mehan berê danustandın hebû. Nuha ev xebat gıha û gaveki gıring hate avêtın.*

*Şeş Parti ev ın: Partiya Pêşeng a Karkeri Kurdıstan (PPKK), Partiya Karker a Tırkiyê (TİP), Partiya Ked a Komunist-Tırkiyê (TKEP), Partiya Komunist a Tırkiyê (TKP), Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê (PSKT) û Partiya Karker a Sosyalist-Tırkiyê (TSİP).*

*Şeş partiyan deklerasyonek derxıstın ku tê da rewşa dınyayê û welat lê dınhêrın û esas û armancên hevkariyê eşkere dıkın. Ew, dı roja iroyini da, ruxandına hukma faşi lı Tırkiyê û pêkanina dêmoqratiyê armanca heri zûtırin dıbinın. Bona vê yekê şeş partiyan programeke diji faşiyê hazırkırın û êlankırın. Dı vê programê da daxwazên gelên Kurd û Tırk yên dêmoqratik rojane û zûtırin cih dıgrın. Şeş Parti, gazi hemû rêxıstın û kesan dıkın ku jı rejima faşi zulm û zordesti dıbinın, jê ne razi ne, çûna wê û pêkanina dêmoqratiyê dıxwazın, bıghên hev û bı hevra kar bıkın bona gihıştına armancên mışterek.*

*Her şeş parti dı deklerasyonê da dıbêjın ku, ew pışti ruxandına hukma faşi dı hukumeta nu a dêmoqratik da ci bıgrın, an negrın, bona rê[illegible]rına vê programê wê kar û xebat bıkın. Lê disa ew dıbêjın ku, ew programa hanê ne bese bo rızgariya neteweyi û cıvaki bı temami. Bona rızgariya herdu gelan bı aliyê neteweyi û cıvaki, dıvê guhartınên şoreşgeri ci bıgrın, wek qutkırına pêvendiyên bendbûnê bı imperyaliyê, tayinkırına qedera mıletê Kurd bı xwe û bı serbesti (heqê çarenûsi), şoreşa axê, û rakırına hukma monopolan bıaliyê abori û cıvaki. Bona vê yekê, şeş parti ilan dıkın ku ewe, pışti ruxandına faşiyê kar û xebat bıkın bo sazkırına hukmeke geli ya dêmoqrat dı pêşengiya sınıfa karkeran da.*

*Partiya me jı roja damezırandınê heya iro bı xurti lı ser pırsa hevkari û cephe dısekıne. Pırsa cephe wek armancek, me dı programê de daye pêş xwe. Em bereki va bo yekıtiya hêzên welatparêz lı Kurdıstanê û bereki vê ji bo yekıtiya hemû hêzên dêmoqrat û dij-imperyaliyê lı temamiya Tırkiyê kar dıkın. Bona vê yekê ye ku Partiya me dı nav vê kar û xebatê da ci gırt û bona pêkanina hevkariyek han bı dıl û can karkır.*

*İro rêxıstınek, an kesek pêşverû, welatparêz tune ku behsa gıringiya yekıtiyê neke. Çı heya ku, kıngê dor hat kar û danustandınê bo yekıtiyê gelek asteng derdıkevın pêş riya me. Her çıqas pêkanina hevkariyê û cephe gelek ferz e û dereng maye ji, hin lı Tırkiyê û Kurdıstanê dı vi ali da tecrube kêm e, her rêxıstın û her kes çı dıkeve ser mılê wi pêk nayne. Bona vê yekê ye ku yekıtiya partiyên çep gaveki gelek gıring e û dıvê em bı xudi derkevın, bı rêva bıbın.*

*Dıkeve ser mılê hemû kesên pêşverû û welatparêz ku bı vê yekıtiyê şabe, pıştgırtiya wê bıke û wê xurt bıke. Rêxıstınên çep ku ne dı nav şeş partiyan da ne, eger bı rasti û bı dıl yekıtiya hêzên çep dıxwazın, dıkarın tê da ci bıgrın. Rêxıstın û kesên dêmoqrat, welatparêz ku rojki berê ruxandına rejima faşi dıxwazın, dıkarın dı platforma dêmoqratik da ciyê xwe bıgrın, mıl bı mıl diji faşiyê kar bıkın.*

*Şeş partiyan, YEKITİYA ÇEP bı daxuyaniyek eşkere kırın. Em vê daxuyaniyê dı vê hêjmarê da neşır dıkın. Werın em yekbın, da ku bıkarıbın faşiyê bıruxinın, welat jı pêrişaniyê, gel jı bındestiyê rızgar bıkın!*

## ME 10 SALİYA PARTİYÊ BI ŞAHİ PİROZ KIR

Partiya me dı 31'ê Çıleyê Pêşin da (Desembır) 10 saliya xwe temam dıke û dıkeve 11 saliya têkoşinê. Jı ber 10 saliya damezırandına Partiyê lı der welat du cıvinên gıring hatın çêkırın. Yek jı wan dı 3'yê Çıriya Paşin (meha yanzde) lı Elmaniya Federal, lı bajarê Koln'ê, ya dınê ji dı 17'ê Çıriya Paşin da lı Stockholmê pêkhat. Herdu cıvin jı ber rêz, bı şahi derbas bûn. Ew herdu ji cıvinên siyasi, her usa çandi bûn. Rêxıstınên bıra û dost, kesên welatparêz û pêşverû an dı cıvinan da amadebûn, an ji bı sılavnameyên xwe pıştgıriya me kırın, bı awayeki fıreh.

Cıvina Koln'ê jı her kesi ra ne vekıri bû û ne hatıbû ilankırın. Disa ji, salona ku 1200 kes tê da ci dıgırt, bı temami tıje bû bı heval û hogırên me û bı kesên dost û welatparêz. Dıgel wan, qasi 100 hevalan lı dor û hundır salonê karê parastıni dıkır û karên çandi û temaşayê pêk dıani. Salon bı sloganên Partiyê hatıbû xemılandın. Dı çardaxê do rojname, kovar û kıtêbên ku Partiyê dı nav van 10 salan da dırxıstıbûn, dıhatıne nişandan. Dıgel vê, dı panoyekê da sûretên hevalan ci dıgırt ku jiyana xwe dı riya azadi û sosyalizmê da wındakırıbûn.

Ronak û şa bû rûyê karker û xwendakarên ku salon tıjedıkırın. Bı bir û baweri û kelekel bûn. Dı destpêka şevê da salonê deng da bı gotına "Bıji Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê"!

Hemû hazıran bo hurmeta şihidên ku jiyana xwe dı riya azadi û sasyalizmê da dabûn, deqeki bêdeng man.

Sekreterê Gıştı a Partiya me Heval Kemal Burkay dı navbera çepıkên gumreh da rabû û derheqa 10 saliya Partiyê da peyivi. Gotara wi dı vê hejmara Riya Azadi da cidıgre.

Dı cıvinê da Heval Heinz Lang, endamê Kımita Rêvebırınê a Partiya Komunistê Elman (DKP), bı navê partiya xwe, û Heval Ehmed Kaçmaz, Serokê Partiya karkerê Sosyalist a Tırkiyê (TSİP) bı navê partiya xwe rabûn peyivin. Em, hın beşên gotara Heinz Lang dı vê hejmarê da neşır dıkın.

Dı cıvinê da zordesti û zêrandına hêzên kolonyalist lı ser gelê me û xebata Partiyê bı aliyê ideoloji, siyasi û rêxıstıni dı van 10 salan da bı kurti

(Dûmahik Rûpel 15 an da)

www.arsivakurd.org

## Axaftına Heval KEMAL BURKAY Dı Cıvina Partiyê Da Bo Pirozkırına 10 Saliya Damezırandına PSKT

# "DI JİYANA PARTİYÊ DA QONAXEKE GIRANBUHA"

Mêvanên hêja.

Hevalno,

Hûn xêr hatın cıvina me bo pirozkırına dehsaliya Partiyê. Ev cıvin bo me, bo endam û dostên Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê gelek gıringiya xwe heye. 10 sal dı jiyan û tekoşina Partiya me da qonaxeki gelek gıranbuha ye.

Partiya me ne dı welateki serbıxwe da sazbûye û nıkare bı serbesti kar bıke. Em dıji sazûmaneke zulm û zordestiyê şer dıkın. Bona vê yekê ye ku em, vê roja hanê ji bı cıvineke lı der, lı welateki biyani piroz dıkın.

Hevalno,

İro gelê me dı hemû parçên Kurdıstanê da bı mêrxasi berxwe dıde ku nirê zordestan bışkine, bıghije azadiyê, riya xwe bı serbesti hılbıjêre. Ev hêzên zordest ku welatê me dı nav xwe da parvekırıne, ew ji, lı pêş çavên hemû dınyayê şereki hov dımeşinın ku berxwedana gelê me bışkinın, gelê me yê 20 milyon jı dınê rakın.

Hukumeta Tırk ku dest daniye ser parçê mezın, hebûna gelê Kurd ji bı temami inkar dıke. Ew propagandeyeki dajo lı ser fort û derewan ku dirok, zıman û çanda gelê me tune. Lê belê, Kurdıstan ta jı demên berê welatê me ye. Lı nıvisandınên Urartûyan lı ser kevıran, lı bedenên kela Diyarbekrê mohra gelê me heye. Edebyata gelê Kurd dıçe hezar salan berê. Gelê me hosteyên wek Melayê Cıziri û Ehmedê Xani û serek û qumandanên bı nav û deng wek Selahaddini Eyubi jı nav xwe derxıstiye.

Gelê Kurd dı diroka xwe da tucar seri daneniye lı ber biyaniyan, dıji êrişkeran bı xurti berxwe daye, xwe û welatê xwe parastiye. Gelê me jı serhıldana Evdırehman Paşa dı sala 1806 bıgre heya şerên partizaniyê ku iro lı çiyayên Kurdıstanê da cih dıgrın, gele caran seri hılda, bo azadi şerkır. Serhıldanên netewi yên berê hemû şıkiyan lı hımber yekıti û hevgırtına dewletên Osmani û İraniyan û bı piştgıriya dewletên kolonyalist û imperyalist ku tevi dewletên zordest ê mıntıqê Kurdıstan lı nav xwe da parvakırıbûn. Welatê me ku çarmedor bı hêzên dıjmınan gırtiye, iro ji ne azad e. Lê çı heye ku hêvi û daxwaza gelê me bo azadiyê tucar venemıri, sıst nebû, sal bı sal gumreh bû. Ev dılşewat iro bı kûrahi dı nav gel da ciyê xwe gırtiye. Gelê me dı hemû parçeyan da bı mêrxwasi berxwe dıde, şer dıke. Dı demeke hanê da ku sedsala 21'a nêzık dıbe, tu hêzêk nıkare pêşi lı vi şeri bıgre. Ev şer wê serkeve, gelê me bend û qeydên bındestiyê wê bışkine, welatê xwe rızgar bıke û jiyaneke nuh û mırovi wê avabıke.

Hevalno,

Bo destxıstına azadiyê û bo xılasbûna ji kedxwariyê ne bes e merıv bı dıl û can karbıke. Dıvê merıv rê û olaxên serketınê ji baş bızanıbe.

Dı demên berê da têkçûna (şıkestına) serhıldanên gelê me ne tenê jı ber gıraniya hêzên dıjmın bû; tevi wê, ew têkçûn jı ber ku gel bı fırehi ne hatıbû rêzkırın, programek baş ku cih bıde maf û daxwazên gel- xasıma yên karker û cotkaran- ne hatıbû nişandan û pırcaran dost û dıjmın jı hev baş ne hatıbû cûdakırın.

Em bı xurti bawer ın ku himê tekoşina rızgariya neteweyi û cıvaki qat û refên xebatkar ın, karker û cotkarên Kurdıstanê ne. Dıvê beri hertışti programek bê nişandan ku ci bıde maf û daxwazên wan. Heya em xebatkaran, ango pıraniya gel hışyar û rêz nekın, wan nekışinin nav refên tekoşinê, heya em wan jı bın tesira kesên fêodal û kevneperest wek mir, axa û şêxan û jı bın tesira propaganda dıjmın xılasnekın em nıkarın bı serkevın. Ewqas tecrubeya tevgera rızgariyê ya gelê me vê yekê xweş nişan dıde.

Partiya me lı ser vê bir û baweriyê avabûye. Em partiya karkerên Kurdıstanê û gundiyên feqir ın. Şerê me bo rızgariya neteweyi û bo sosyalizmê ye. Em baş dızanın ku rızgariya mılleteki ne tenê pırsa sinor û aleki ye. Heya ku gelê me negıhije sosyalizmê nıkare jı teda û zêrandınê bı temami rızgar bıbe û bı her awayi azad bıbe. İro lı rûyê dınê gelek gel hene ku xwedi dewletên neteweyi ne lê ne azad ın, dı bın hukım, teda û zêrandına kevneperest û bûrjûvayên "xwe" da ne.

Lê Partiya me qonaxên şoreşa Kurdıstanê tevlıhev nake. Em dızanın ku tevgera rızgariya me dı qonaxa pêşen da şoreşek netewi-demoqrati ye. Ango, dıvê berê hertışti nirê kolonyaliyê lı ser welat bê şıkandın, gelê me qedera xwe bı serbesti tayin bıke, bı şoreşa axê pêvendiyên fêedali bên paqışkırın, û abori û çanda gel bıkeve riya pêşketınê.

Bona vê yekê dıvê em hemû hêzên welatparêz, hemû ref û tebaqên azadixwaz dı cepheyeki netewi-dêmoqrati da bıghinın hev û dıji kolonyaliyê û kevneperestiya fêeodali. Partiya me kar û xebat dıke ku bona pêkanina cepheyeki han gavên pêşin bên avêtın.

Programa kêmayi a Partiya me, programa şoreşa neteweyi-demoqrati ye û ew gora mafê hemû hêzên neteweyi ye, daxwazên wan ên himi datine pêş. Programa me yê dûr (fıreh) sosyalizm e û bı raya me, dı nav van herduyan da bendên Sinê tunın, merıv dıkare jı yekê derbazi yê dın bıbe.

Bu kurtahi, programa partiya me dıkare dı her qonaxeki da hêzên şoreşger û welatparêz bıghine hev û berê wan bıde şoreşê

Hevalno,

Em dı şerê rızgariyê da pışta xwe beri hertışti bı hêza gelê xwe gırêdıdın. Geleki gırti heya ku xweş rêz nebe û dest bı şerê rızgariyê neke tu hêzek lı dınê nıkare wi jı zordesti û kedxwariyê rızgar bıke. Şoreş jı der nayên stendın û jı der va nayên şandın.

Dı Sedsala Bistan da şerên rızgariyê ya gelek mılletan û gelek şoreşên cıvaki ew yek xweş bı dozkırın. Û em bawer ın ku, welatê me dı nav çend dewletan da parçekırı û bı hêzên dıjmın ên xurt dorlêgırti be ji, hımber ewqas şeraitên xırab, hêza mezın bo serketınê, rızgarixwazi û yekıtiya gelê me ye. Tu partiyek û rêxıstınek ku baweriya xwe bı hêza gel neyine, eger kar neke vê hêzê rêzbıke û bıkşine nav refên şoreşê û pışta xwe nede wê, nıkare rêberiya gel bıke û gel bıghine serketınê.

Dı salên çûyi da me Parti ditın ku bo rêberiya tevgera rızgariyê derketıbûn rê, lê baweriya wan bı gel kêm bû, gora maf û daxwazên karker û cotkaran programek danenibûn pêş û guh nedan rêzkırına wan. Ew partiyana serneketın. İro ji disa em hın kesan dıbinın ku pışta xwe jı gel zêtır jı hêzên derva ra gırêdıdın, rızgariyê jı destê beyaniyan hêvi dıkın. Ew xwe dıxapının.

Em dı şerê rızgariyê da pışta xwe, beri hertışti bı rızgarixwaziya gelê xwe, bı kar û xebata gel gırêdıdın. Lê her usa ji, em baş dızanın ku bo serketınê hevceye dı welat û cihanê da dost û dıjmın jı hev baş bên cudakırın. Dı dema me da dı cihanê da hêzên şoreşê û dıj şoreşê tesirek mezın lı ser hev dıkın. Cudakırına dost û dıjmınan bo serketınê şertek gıring e.

www.arsivakurd.org

Dostên gelê me beri hemûyan welatê sosyalist ın- û kela wan Yekıtiya Sovyêt-, tevgera karkerên hemû welatan û hêzên rızgariya neteweyi ne lı cihanê. Em gelek bı gırani lı ser dostani û pıştgıriya hêzên aşıtixwaz, demoqrat û mırovhız dısekının lı cihanê.

Dıjmınên gelê me hêzên imperyali ne, hêzên kolonoyali ne ku welatê me parçe û gelê me dil kırıne û hemû kevneperest, hevkar û xulamên wan ın.

Em gelên (xelkên) wan dewletan ku Kurdıstan dı nav xwe da parçekırıne, jı xwe ra dost û heval dıbının dı şerê dıji zulm û zordestiyê de. Partiya me ku dı Kurdıstana Tırkiyê da bo rızgariya netewi û cıvaki şer dıke, qimetek gelek bılınd dıde hevkariya gelê Tırk, dıxwaze û kar dıke ku vi şeri bı xebatkarên Tırk, bı şoreşger û demoqratên Tırk ra mıl bı mıl bımeşine. Em, pêkanina cepheyek mışterek bo herdu gelan hewce û şert dıbının dıji imperyaliyê û bo demoqratiyê û bona vê yekê kar û xebat dıkın.

Bı raya me, bo rızgariya neteweyi û sosyalizmê, bo avakırına hukmeke geli û demoqrati em herdu gel dıkarın bı hevra karbıkın. Gelê Kurd dıkare lı Kurdıstana Tırkiyê Cumhuriyetekê sazbıke û bı gelê Tırk ra, lı ser esasên wekhevi, federasyoneke demoqratik pêk bine. Gora hal û rewşa diroki, gelê Kurd dıkare cuda be û dewleteki serbıxwe ji çêke. Programa me jı van herduyan ra ji vekıri ye. Û em, gora rewşa diroki û mafên xebatkaran, yeki jı van herduyan dıdın pêş xwe.

Wexta dost û dıjmın jı hev baş neyê cudakırın tevgera rızgariyê dışkê û kar û xebata gel avê da dıçe. Dı salên bori da riya ku Parti Dêmoqrati Kurdıstana Iraq gırtibû bo vê yekê misalek baş e. Melle Mıstefa guh da Şahê kevneperest û imperyaliya Amêriki, baweriya xwe bı wan ani û bendên şoreşê da dest wan. Ew xeletiya mezın bû sedemê şıkestına gıran dı sala 1975 da. Baweri-kırın bı imperyalizmê û xulamokên imperyalizmê jı mıletê Kurd ra ixanetek mezın bû.

İro ji hın kes hene ku jı dema çûyi dersên baş nestandıne. Ew guh nadın hêza gelê me yê tekoşer, bo yekıtiya hêzên welatparêz bı dil kar nakın, guh nadın dostani û pıştgıriya dewletên sosyalist û hêzên şoreşger û demoqrat lı cihanê, bo vê kar nakın û bala xwe bı gırani dıdın zıddiyeta İran û Iraqê, stratejiya xwe lı ser vê yekê çêdıkın û lı dostên xwe lı ciyê dınê dıgerın. Jı ber xeletiya han, ew carcaran dıjmın lı wır dıhêlın û şerê hevdu dıkın; gel jı şoreşê sar dıbe û dıjmın hêz dıstine.

Bo rêxıstıneke şoreşger serxwebûna siyasi û pêşta anina mafên şoreşê tıştiteki gelek gıranbuha ye. Yên ku guh nadıne vê esasê nıkarın jı xwe ra û jı gel ra rê rastbıkın, jı armanca rızgariyê dûrdıkevın û zırarên mezın dıdın şoreşê.

Em pıştgıriya hêzên welatparêz dıkın lı Kurdıstana İran û Iraqê bo daxwazên neteweyi û cıvaki; lê em, dıji xeleti û şaşiyan ji bala rêxıstınên van parçeyan dıkışinin careke dın.

Partiya me gelek waxt e ku cehd dıke bo pêşvebırına hevkari û pıştgıri yê navbera hêzên welatparêz ên herçar parçeyan, bo danina pêş armanc û esasên mışterek û bo karanina hemahengi dı temamiya tevgerê da. Lê çı heye ku hın rêxıstınan guh nedan vi kari û bona vê yekê ji heya nıha kareki baş û berbıçav nehate kırın.

Hevalno,

Partiya me 10 salên xwe temam dıke. Partiya me wek rêxıstıneke siyasi ne ya pêşin e ku lı Kurdıstanê avabûye. Beri me ji Parti hebûn. Lê derketına Partiya me bı awayeki dın ehemmiya xwe heye. Me partiya karkeran avakır lı Kurdıstanê. Partiya me lı ser himê Marksi-leniniyê çêbû.

Gelê me bı ali serhıldan û berxwedanê xudi tecrubeyek mezın e. Ew hewcedari rêxıstınek şoreşger bû. Jı gele şer û serhıldanan xweş eşkere bûye ku sınıfên fêodal û bûrjuwa û her usa ji bûrjuwaziya pıçûk-ku pırcaran çı dıke, çı dıxwaze nızane, dı navbera şaşıtiyên çep û rastiyê da tê û dıçenıkarın rêberiya tevgera rızgariya gelê me bıkın, vê tevgerê jı rê û dırbên zor û teng bı hostati derbaz bıkın. Eger em dıxwazın tevgera rızgariyê ber bı pêş bıçe, bı sosyalizmê temam bıbe, dıvê sınıfa karkeran pêşengiya şoreşê bıke. Em vê yekê dıkarın bı pêşengiya partiyek Marksi-Lenini bı kar binın.

Ango Partiya me jı vê hewcedariyê pêk hatiye. Bona vê yekê rewş gıha, kingê tevgera karkeran û ya welatparêzi pêşva çû û gıha dereceke bılınd lı Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê. Derketına Partiya me dı tevgera rızgarixwaz da qonaxeke nu nişan dıde. Êdi karkerên Kurdıstanê û cotkarên feqir dı tevgera rızgariyê da ciyê xwe gırtıne. Nah şunda ewê mohra xwe lı tevgerê xının.

10 saliya Partiya me nişan dıde ku ewana destpêkırın mohra xwe lêdıxının ji. Dı van 10 salana da rê û olaxên xelet yek bı yek hatın eşkerekırın. Pırsa neteweyi dı Kurdıstana Tırkiyê da jı halê loriyekê dı devê bûrjuvaziya pıçûk da xılas bû, lı ser bıngehên xwe yê abori û cıvaki bılınd bû, goşt û can gırt. Dı tevgerê de rola xebatkaran hat eşkerekırın. Bir û baweriyên sosyalizma ilmi dı nav refên gel da belav bûn, bıngeh gırtın. Ew bir û baweriyên han û programa ku me pêşkêş kır. tesira xwe lı ser komeleyên bûrjûwaziya pıçûk ji nişan da; ew jı hev ketın û qısmek jı wan rûyê xwe dan ber bı sosyalizmê.

Em, endamên Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê, gelek serbılınd ın ku me dı Kurdıstanê da rêxıstıneke karkeran a siyasi, parityeke Marksi-Lenini avakıriye. Dıjmınên sosyalizma ilmi çı dıbên bıla bıbên, em bawerın ku rızgariya gelan û ya hemû xebatkaran dı vê rê da ye. Marksi-Lenini dı dest xebatkaran da çekê heri mezın e bo rakırına zulm û zêrandınê, bo avakırına jiyaneke nu û gihiştına rojên delal.

Hevalno,

Ew 10 sal ne demeke gelek dırêj e û me ew bı hevra derbas kır. Ne hewceye ez dı vê axaftınê da dûr û dırêj lı ser tekoşina Partiyê bısekınım. Lê dıxwazım bı kurti behsa hın kar û xebatên me bıkım.

Me ev 10 sal dıji dıjmıneki xwinxwar bı tekoşineke xurt derbas kır. Ew dıjmın ku dıji tevgera şoreşgeri bê merhemet e û xasıma dıji rêzbûna gelê Kurd û daxwazake pıçûk ji hovitiya xwe nişan dıde.

Partiya me dı van 10 salan da dıji dıjmınê kolonyalist propagandeyeke xurt sazkır. Dıgel êrişkeriya polêz ji me kovara Partiyê a teorik, Riya Azadi 10.000, rojnama geli Roja Welat 30.000 û hın caran ji vê zêdetır çap û belav kır.

Lı aliyekê kovar û rojnama me, lı aliyê dın kıtêbên neşırxana Riya Azadi lı ser hışyarbûna gel, eşkerekırına çerxê zulm û zordestiyê û ditına riya rızgariyê tesirek mezın kır. Me bı zımanê xwe ji nıvisand û dı diwarên dıjmın da qul vekırın. Ev karên han, propagandê dıjmın derheqa dirok, zıman û çanda gelê me tar û mar kır, bir û baweriya gel xurt kır.

Partiya me bo rêzkırına gel jı rê-olaxên eşkere û niv-eşkere istifade kır. Kar û xebat kır dı sendikatan da, komelên demoqratik yên xebatkaran da, dı nav cıvanan û gundiyan da û gelek rê stend.

Partiya me dı sala 1977 lı Diyarbekrê û dı sala 1979 da lı Gıridaxê seroketiya belediyê qezenc kır. Ew ji xweş nişan dıde ku Partiyê dı nav gel da kareki baş kıribû, dı demeki kurt da maf û daxwazên gel baş eşkere kıribû û pıştgıriya gel stendıbû.

Partiya me dıji êrişa hêzên faşi dı nav refên gel da kar û xebat kır û bı xurti berj wan da; cehd kır bo yekıtiya hêzên dıji faşiyê.

Jı 12 İlona sala 1980, hatına hukma leşgeri vır da ji Partiya me tucar xwe şaş nekır, sıst nebû, dıji hukma faşi lı gırtigehan û lı nav refên gel, lı der û lı hundır welat kar û xebata xwe bı xurti dımeşine.

Hevalno, şık tune, dı şer da pêşveçûn ji, şunda vekişin ji heye. Riya pêş me gelek dırêj e, karê ku dıvê em bıkın gelek pır e. Me tucar negotiye ku serketın dı demeke nêzık da û bı hêsani bı dest dıkeve. Lê em dıkarın bı hêsani û bı baweri bêjın ku himên tekoşinê hatına danin. Bıngehê şerê me yê rızgariyê bı aweyê ideoloji û strateji dı xeteke rast da hatiye avakırın. Û nıha, barê ku dıkeve ser mılê me ev e, em riya xwe şaş nekın, xwe nedın çep û rastê, lı ser vê bıngehê tevgerê bılınd-kın.

Lı ser pırsên ideolojik û stratejik û lı ser şıklên xebatê da dı navbera me û kesên dınê da ferq hene û ew tıştеki tabii ye. Ne ku ez zagonên şoreşê cardın kıvşbıkım û lı vır lı ser gıli-gotın

www.arsivakurd.org

bıkım. Zagonên şoreşê bı destê hostayên mezın dı zû da hatıne eşekerekırın û dı welatên dınê da rêberiya partiyên karkeran kırıne. Dıvê em ji wan gora rewşa welatê xwe bı hostati bı kar binın.

Em şoreşgerên Kurdıstanê eger dıxwazın riya xwe şaş nekın dı nav tevna peyvendiyên pırali lı dınyayê û dı nav ewqas pırsên Rojhılata Navin, dıvê em zagonên şoreşê tucar jı pêş çavan wındanekın.

Em dı şoreşê da beri hertışti dıvê pışta xwe bı gel gırêdın. Dıvê em dı vê tevgerê da rola bıngehin a karkeran û gundiyên feqir tucar jı bir nekın û bala xwe bı xurti bıdın rêzkırına wan. Şoreş jı bo gel e, kingê ew tevlê bıbe, şoreş wê serkeve.

Dıvê em dost û dıjmınên şoreşê baş jı hev cuda bıkın.

Rızgari bı tekoşin dest dıkeve. Eger em sıngê xwe nedın ber jan û çetinahiyên tekoşinê, nagıhijin azadi û sosyalizmê. Bona vê yekê, dıvê em wek rêxıstınek, dı mêraniyê da, dı fıdakari û jiriyê da dı pêş da bın.

Lı ali dın, bı tevgera şoreşgeri ra nayê leyistın. Şoroşegeri bı macereperesti nabe. Şoreş bireweri, hostati û bihneke dırêj ji dıxwaze. Eger merıv hêza xwe û ya dıjmın, psikolojiya gel û rewşa navnetewi baş nede ber çavan û xwe bavêje pêş û lê bıqelıwe, hım bı xwe zırara mezın dıbine, hım ji zırarê dıde gel.

Ew rastiyên han jı gelek tecrubeyên tevgera şoreşgeri hatıne stendın. Eger em wan jı xwe ra bıkın rêber, şık tune, emê bıkarıbın ber bı pêş bımeşın û bı serkevın.

Hevalno,

Îro dı warê navnetewi da pırsa aşıtiyê jı hemû pırsan pêşva tê. Jı ber ku hêzên imperyaliyê, dı pêş wan imperyaliya Amêrika Yekbûyi, zordıdıne çêkırına çekên nu, çekên nukleer û xetera şer roj bı roj zêtır dıkın.


Pışti şerê Mezın ê Duwemin hêzên sosyalizmê lı Cihanê xurt bûn. Sistema kolonyali belav bû. Xasıma dı salên 1960 û 70'yan da lı rojhılata dûr ê Asiya, lı Afriqa, lı Amêrika Latin şerên rızgariya neteweyi bı serketın û hın jı wan berê xwe dan sosyalizmê. Dılê imperyaliyê tucar jı vê yekê ra razi nabe. Ew gelek bı hêrse ku hukma xwe lı cihanê sıst bûye. İmperyali, bona ku warên zêrandınê bıparêze, sengerên ku wındakırıye şunda vegerine, cardın zorê dıde ûsûlên şer û pêvçûna eşkere. Dagırtına Lubnan û Grenedayê, têkılbûna Nikaragua û El Salvadorê û pıştgırıya kevneperestên Afganistanê vê yekê baş nişan dıde.

Lê hin jı vê xetertır eve ku, hêzên zêtır kevneperest û şerxwaz -dı pêş wan da imperyaliya Amêrika Yekbûyi- cehd dıkın hımber sistema sosyali dı aliyê çekên nukleer da xurttır bıbın û sosyalizmê bı riya şer jı dınê rakın. Ew vê daxwaza geni eşkere dıbêjın. Bona vê yekê ye ku dı salên dawi da xetera şer cardın mezın bûye û parastına aşatiyê, pêşilêgırtına şereki mezın bûye pırsa hebûn û nebûnê bona insanetiyê.

Dıvê iro em dıji vê siyaseta imperyaliyê bı xurti derkevın, dor lı hêzên şerxwaz bıgrın, tesira wan bışkinın. Bıla çêkırına çekên nukleeri bê sekınandın û ew hêdi hêdi bên rakırın. Îro parastına aşıtiya cihanê bûye beşek jı şerê me bo azadi, dêmoqrati û sosyalizmê. Û ew wek parastına jiyanê û duwerojê insaniyetê ye.

Gelê me iro dı şerê rızgariyê da ye. Lê parastına aşıtiya cihanê her usa ji pırsa me ye. Em, ji dı nav tevgera aşıtiyê da ne.

Ew sazûmana kolonyali û faşi ku zulm û zordestike mezın lı me dıke, dı pışt wê da hêza mezıntırin imperyaliya Amêrika Yekbûyi ye. Lı Tırkiyê çêşûna hukma faşi bı destê imperyalistên ênşker û kevneperest bû.



" Jiyana xwe dı riya azadi û sosyalizmê da dan.
Emê têkoşina wan bıdominın ".

Hukma faşi bereki va bırçıtı û betaliyê fıreh dıke, bereki va ji hebûna welat dıde kırin û çêkırına çekan. Wê razibûna xwe nişan da bo ciwarbûna hêzın lezık ên Amêrika Yekbûyi lı welatê me. Lı Tırkiyê û Kurdıstanê balafırgehên leşkeri û leşkergehên nu hatın çêkırın. Welatê me bû ênşgeh bo Amêrika Yekbûyi û NATO dıji gelên cinar.

Cûnta, leşkerê xwe jı Qıbrısê nakışine, lı Behra Egê dıjayetiyan kûr dıke û çavê wê lı erdê cinarên xwe ye.

Hevalno,

Cûnta faşi dı meha Tebaxê da bûyerên Erûh û Şemdinan kın mane û êrişeke mezın ê nu ani ser gelê me. Ew dıxwaze bı maneyê van bûyêran plana xwe yê berê bı ci bine.

Cûnta ev çar sal e ku zordestiki mezın dıke lı ser gelê me. Lê disa ji wê dit ku berxwedana gelê me ne şıkiyaye. Cûnta bı vê êrişê dıxwaze derbên mezın lı hêzên welatparêz xwe û çavê gel bıtırsine. Ew, her usa ji, dıxwaze mıntıqê sinor valabıke û gelê me cardın menfi bıke Rojavayê û destpêkır ji. Cûnta dıxwaze sinorên Iraq û İranê ji bı qumbele û têl jı parçên Kurdıstanê yên dın veqetine wek sinorê Sûri. Lê ev ji jê ra bes nake, Cûnta, bona pelıxandına şerê partizani lı parçeyên dın, jı sinor derbas dıbe û dıji gelê me dı nav sinorên Iraq û İranê da şer dıke.

Xuyaye ku sazûmana kolanyali û faşi bı her awayi cerditi dıke. Ew, heq û azadiyên mırovi, zagonên navnetewi dıde bın lıngan û zordesti û xwinxwariyê da tu sinori nas nake.

Ewqas leşkerê ku dı berê da lı Kurdıstanê bû bes nekır, Cûntayê hêzên leşker û polêzên nu şande welatê me. Mırovên me wek dema serhıldanên Gıridax û Dêrsım bı bendan bı hevra tên gırêdan û dı kampên leşkeri da tên cıvandın. Gelek gund hatın bombekırın û walakırın. Cûnta û radyo têlevizyona wê, rojnamên wê, gelê me wek haydût û cerd bı nav dıkın, rık û xezeba xwe nişan dıdın.

Cûnta Faşi van bûyêran gelek mezın nişan dıde, qala militanên ASALA dıke lı wi ali sinor, zor dıde derewan. Bı vi awayi, ew dıxwaze lı der û hundır welat xelkê bıxapine.

Jı ber zordestiya ku ev çar sal ın dajo û tê, jı ber bırçıti û betaliya fıreh, rûyê Cuntayê dı nav gel da ne maye. Bona vê yekê, Cunta dıxwaze welat dı nav xetereki mezın nişande, şovınizmê bılındke, bala gel bıkşine ciyê dın û cardın xelkê lı dor xwe kom bıke. Cunta, her usa ji, cehd dıke hêzên demoqratik yên dervayi welat ku zorê dıdınê bo derbazbûna dêmoqratiyê, bıxapine û jı wan ra nişande ku rewşa Tırkiyê ne mısaide bo derbazbûneke han û bıkarıbe zor û tedayê gıran bıke.

(Dûmahik Rûpel 13'a da)

# AXAFTINA BI NAVÊ DKP

*Endamê Komita Rêvabirınê ya Partiya Komunist a Elman, Heval Heinz Lang, tevi cıvina Koln'ê bû û bı navê partiya xwe qısekır. Em lı jêr hın beşên axaftına wi neşır dıkın.*

Heval û hevrêyên eziz,

Ez, bı navê Komita Rêvebırınê a Partiya Komunist a Elman 10 Saliya Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê piroz dıkım û sılavên pıştgıriyê jı we ra tinım.

Dı diroka partiyeke şoreşger da 10 sal nisbiyen demeki kurt e. Lê ev deh sal bı tekoşina dagırti ye, dıji zulm û zêrandınê. Ev deh sal, dıji nıjadparêzi û şovınıyê, bo azadi, dêmoqrati û sosyalizmê bı têkoşineke xurt û canfıdakari dagırti ye.

Em bı hurmet û her usa ji, bı pıştgıri bala xwe baş dıdıne têkoşina rızgariya netewi ya gelê Kurd ku ew dı bın zordestiya taxımê faşistê leşkeri dımeşine. Ev têkoşin cardın ıspat dıke ku, hımber ewqas şovıni, zordesti û têror, hımber ewqas eza-cefa û qurban, hêviya azadi û dêmoqratiyê jı çerxa zordestiyê ya mıstek generalên faşi zêtır xu ttır e.

Serda ji, rejima zordest a Tırkiyê xweş fêm dıke ku, ew bı tena xwe nıkare pêşi lı tekoşina gelên Kurd û Tırk bıgre. Bona vê yekê ew, zû bı zû jı hevalbendên xwe yê NATO, xasıma jı hêzên imperyali ya Dewletên Yekbûyi ya Amêrika (DYA) û Elmaniya Federal alikari pars dıke. Bona vê yekê, peymanên rezil û ruswa û dıji gel çê dıke bı hukumeta Iraq'ê ra. Bı vi awayi, cawê imperyaliyê ya êrişker cardın xwe eşkere dıke. Hêzen kevneperest, bona parastına hukum û mafên xwe, hevkari dıkın bı rejimên xwinxwar.

Çı heye ku, hêzên imperyali çıqa pıştgıriya rejima faşi ya Tırkiyê dıkın bıla bıkın, tucar nıkarın serê gelê Kurd nızm bıkın, geleki usa serbılınd û dı şerê rızgariyê da jir û çalak.

Hercar em gelek xemgin dıbın û dılê me pê dêşe, kingê em dıbıhisın êrişên celladên Cunta faşi ser gelê Kurd. Lê çawa faşizma Elman bı ewqas zordesti, kuştın û qırkırın ne kani xwe jı têkçûne xılaske, ew kırınên han ji, tucar nıkarın pêşi lı serketına gelê Kurd bıgrın dıji zordestên xwinxwar.

Diroka sınıfa karkeran a navnetewi û ya tevgerên rızgarixwaz xweş nişan dıde ku, diktator û hemû sazûmanên zalım tên û dıçın, lê gelên ku bo rızgariyê berxwe dıdın, dımının. Û ew têkoşin çıqa bı hevra bê meşandın, mesûlên vê cerdıtiyê (eşqiyatiyê) ku lı gelê Kurd tê kırın, taxımê faşiyê leşkeri ya Tırkiyê, ewqas zû bınax dıbe dı nav qırêjiya dirokê.

Hevrêyên Hêja,

Em dızanın tekoşina we jı vır, çawa dı rewşeke tevlıhev û çetın da bı rêva dıçe. Dıgel vê ji, ez dıkarım bêjım, xebata we berên baş hasıl dıke jı bo pıştgıriya gelê Kurd lı Elmanya Federal. Roj bı roj zêtır kesên dêmoqrat fêm dıke, rejima zordest a Tırkiyê çı ye, çı nıne. Lı Elmanya Federal, roj bı roj zêtır kes mehkum dıke alikariya siyasi, moral û leşkeri ku Hukumeta Federal dıde rejima faşi.

Heval Heinz Lang, lı siyaseta hukumeta Elman rexne gırt derheqa pırsa beyaniyan da û behsa dıjayetiya xeriban kır ku qısmên sermiyandar kış dıkın. Wi nişan da ku, armanca wan ev e, karkerên Elman û yên beyani ji hev veqetinın, dubendi bıkın nava wan. Wi, gıringiya yekıtiya karkeran nişan da û usa got:

Em bı hevra û dı rewşeke gıran da kar dıkın. Em bı hevra berxwe dıdın dıji kêmkırına heqên me yên cıvaki û dêmoqrati.

Em bı hevra dıji siyaseta "parçe bıke û idareke" û dıji dıjmıntiya beyaniyan a rezil û ruswa, derdıkevın.

Heinz Lang, axaftına xwe usa temam kır:

Partiya Komunist a Elman bı pıştgıriya wek pola lı cem we ye. Ew bı hemû hêza xwe lı cem gelê Kurd e.

Enternasyonaliya proleterya beşek e jı baweriya me Marksistan ku pê ra keliya ye.

Tekoşina me ji, wek PSKT, jı bo aşıti, azadi, dêmoqrati û sosyalizmê ye.

Ez jı cıvina 10 saliya Partiya we ra bı dıl serfırazi dıxwazım.

Ez jı we û Partiya we ra serketın dıxwazım dı kar û xebata we da bo yekıtiya hêzên dêmoqrat.

Azadi jı bo gelê Kurd!

Bıji PSKT!

Bılındi jı pıştgıriya internasyonali!

# PARTİYA KOMUNİST A IRAQ

*Hevalên Gıranbûha yê Komita Merkezi ya Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê*

*Hevalên Gıranbûha,*

*Rê bıdın me, em bı navê Komita Merkezi a Partiya me, Partiya Komunist Iraq, bı navê hemû endam û peşmergeyê me we be têkoşeri piroz kın û jı we ra bo biranina sala dehan bo avakırına Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê û bo bıcihanina armancên we yê dademend bı dıl û can serketın dıxwazın.*

*Ev bıranina dı wan mercan da pêkte; tevgera rızgarixwaza Kurd xebata xwe berdewam dıke bona mafên xwe yê netewi û adıl. Ev xebata ku Partiya me tım û tım pışgıri û tê da beşdari kır û dıke û çarelêkırına pırsa netewi ser prensiba marksi-leniniyê dıbine.*

*Hevalno,*

*Bêguman, tevgera rızgarixwaza netewi a Kurd bı pışgırıya tevgera çina karker û hêzên pêşverû lı Tırkiyê û avakırına cepheki nıştımani-yekbûyi geş dıbe. Ewe destbereke bıngehine bo bıcihanina armancên xebatê dı van mercên iroyini de. Tecrûba Partiya me a Komunistê Iraqê wê rastiyê nişan dıke; hêzên netewi a Kurd lı welatê me da iro bı partiya me ra û bı hêzên pêşverû ra dı cepheki nıştımani da pışgıriya xwe dıkın û têkoşinê dıdın bo "Dêmoqrati jı Iraq ra, otonomiya rast jı Kurdıstan ra".*

*Waletên me Iraq û Tırkiyê, dı bın nira siyaseteke têroristi û diktatori derbas dıbın; mêtodên faşisti lı dıji wan bı kar tının û netewa Kurd lı herdû welatan da zordestiyeke netewi û siyasiya şovınıyê dıbının. Ev hebûna hêzên pêşverû lı Iraqê û Tırkiyê detine ser riya xebata yekbûyi jı bo rızgariyê û dêmoqratiyê û jı bo bı cihanina mafên netewi yên dademen jı gelê Kurd ra û jı neteweyên bıçûk ra.*

*Hevalên gıranbûha,*

*Partiya me a Komunist ya Iraq xebata xwe dıdomine bı hevkariya hevalbendên xwe dı cepheki nıştımani-dêmoqrati Iraq da (CUD), bı her tehereki û bı rêya xebata çekdari û wê xebata bılınd dıke bona kutakırına şerê dıjmın lı ser bıngeha lıhevhatıneke dêmoqrati dademend û hılweşandına diktatoriya faşi û avakırına hukumeteke dêmoqrati jı gışt hêzên bo bıcihanina dêmoqratiyê jı Iraqê ra û otonomiya rasti jı Kurdıstanê ra.*

*Rê bıdın me, em carek dın bona biranina avakırına Partiya we pışgıriya xwe nişan bıkın bı têkoşina we ra û jı we ra serketın dıxwezın dı xebat û çalakiyên we da bı interesa gelê Tırk û Kurd mı Tırkiyê û bo bıcihanina rejimeke dêmoqrati, ku bıkare çare bıbine jı pırsên abori, cıvaki û siyasi ra û daxwaziyên mılet bı cih bine dı paşeroja baştır da.*

*Em we bawerın, ku pırsa wa ya dademend, ku hûn jı bo wê xebateke dıdominın û lı ser wê rêyê êş û dıjwariyan dıbinın; wê bı ser keve, jı ber ewa pırseke dademend e.*

*Lı gel teqdir û serfırazi.*

*Komita Merkezi a Partiya Komunist ya Iraq*

www.arsivakurd.org

# PARTİYA KOMUNİST A SÛRİ

*Hevalê Têkoşer Kemal Burkay, Sekreterê Gıştî*
*Hevalê Endamên Komita Merkezi ya Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê,*

*Dı biranina sala dehan da bona avakırına Partiya we- Partiya Sosyalisti Kurdıstanê, em jı we ra û hemû endamên Partiya we ra pirozbahiya germ dışının. Herweha em pışgıriya xebata we dıkın ya ku hûn bı Partiya Komunist a Tırkiyê ra û bı hemû hêzên nıştımani û pêşverû ra dıkın, bo hılweşandına diktatoriya xwini û pêkanina hukmeki nıştımani, dêmoqrati lı Tırkiyê û jı bo parastına serbıxweyiya wi welati û rızgarkırına wi jı bazên leşkeri Amêrika yên hatiye danan lı ser axa wi û pêkanina dêmoqratiyê jı gelê Tırk ra û mafê çarenûsi jı gelê Kurd ra.*

*Lı Tırkiyê hêzên dêmoqrat û pêşverû bona dêmoqratiyê jı miletê Tırk ra û jı hemû neteweyên dın ra û jı bo Tırkiye nebe bazeke dıjmani bo emperyali dıji gelên têkoşer lı navçe; dıji serbesti û pêşveçûna wan dıji Yekıtiya Sovyet-ciranê mezın û dostê dılsoz jı gelê Tırk ra û hemû gelan ra. Ew xebata gernasi tevgırêdaneke gıring e, bı xebata mıletê me ra lı Suriyê û jı hemû hêzên tevgera rızgarixwaza nıştımani Erebi ra, dıji planên imperyalizmê, siyonizmê û kevneperestiyê û ev bıreke jı xebata gelemper a mırovayiyê bı rêva dıbe dıji stratejiya şerxwazi, dıjmınati û dewletên Amêrika Yekbûyi bı kartine lı dıji aştıti û serbestiya mıletan.*

*Lı gor tecrûba me em bawerın ku bıhêzkırına pêwendiyên dostaniyê û hevkariyê bı Yekıtiya Sovyet ra û Partiya wi ra û bı hemû hêzên aştiti û pêşketınê lı cihanê ra we xebata me hêztır bıke û cepha hevdostên mıletê Tırk fıreh bıke û wê arikar be bo serketına xebata we jı bo Tırkiye rızgar û dêmoqrat û jı bextewari û pêşketına gelê Tırk bı hemû neteweyên xwe ra.*

*Endamê Mektebi Siyasi a Parti Komunist Sûri*
*Remo Şêxo-Ferho (Ebu Cengo)*

# Partiya Karkeran a Komunist (Swêd)

**Bo Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê**

**Hevalên hêja,**

**Bo vexwendına we jı ber 10. saliya damezırandına Partiya we em sılavên xwe yên dılgermi û bırati jı we ra dışinın. Pır mıxabın, fırsend nebû ku em tevi cıvina we bın, bona ve yekê mesajê jêrin dışinın:**

**Partiya Karkeran a Komunist-Swêd, sılavên xwe jı cıvina we ra dışine û jı bo partiya we û gelê we serketın dıxwaze dı şerê dıji zordestiya neteweyi da. Em bı xurti lı pışt we ne dı tekoşina we da bo rızgariya neteweyi, dêmoqrati û sosyalizmê.**

**Bı sılavên şoreşgeri û hevalti.**

**Partiya Karkeran a Komunist**
**Serok Rolf Hagel**

## PARTİYA SOSYALİST A AVUSTRALYA

Komita Merkezi

Jı Bo Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê

Hevalên Hêja,

Dıbe ku sılavnama me dereng bımine bo cıvina we yê lı sısêya Novemberê, lê em dıxwazın, qe nebe pıştgıriya xwe û daxwazên xwe yên çêtırin bıghinın gelê Kurd ku ew gelek salên dûr û dırêj bı mêrxwasi şer dıke bo rızgariyê.

Em protesto dıkın zulm û hovitiya hukma Tırkiyê teda, gırtın û hêlandına zori ku ew bı dıji gelê Kurd bı kar tine.

Tevgera gelê Kurd beşek e jı şerê dıj-imperyaliyê lı temamiya cihanê. İmperyali cehd dıke gelan bındest bıke lı her derê, karhêza xebatkaran bızêrine û wan bıde kuştın dı şeran da bo bındestkırına kesên dın. Militaristên Tırk ên faşi xasıma jı imperyaliya Amêrika Yekbûyi pışt dıgrın û bı aliyê wan tên rextkırın. Ew dıjmınê hemû gelên azadixwaz ın.

Bo ku dengê tevgera we bê bıhistın û xurt bıbe, çı jı destê me bê emê bıkın û jı we ra pıştgıri nişandın, gora bir û baweriyên me yên internasyonali. Jı ber ku şerê we beşek e jı şerê gelê Avstralya ku ew dıxwaze jı bıngehên leşkeri yên Amêrika Yekbûyi û jı peymana navbera Avusturalya û Amêrika Yekbûyi xılasbe, ku ev welatê me dıkın xetera şereki nukleeri gora planên serokatiya Amêrika Yekbûyi.

Em jı Partiya we ra xurtbûn û serketınên nu dıxwazın dı şerê dıji zulmê da, bo avakırına dêmoqratiyê û destxıstına heqên neteweyi bo gelê Kurd.

Em lı cem we ne

P. D. Symon -Sekrıterê Gışti

# Partiya Sosyalist a Pêşverû

**Grubê Parlamenê lı Hollandê**

**Hevalên Hêja,**

**Pır mıxabın, Grûbê Parlamenê a Partiya Sosyalist a Pêşverû nıkare dı cıvina we yê sısêyê Novembırê da beşdar be.**

**Em jı we ra xweşi û serketın dıxwazın dı şerê we yê bo azadi, dêmoqrati û sosyalizmê da.**

**Bı sılavên hevalti.**

**Serok Huinder**

# PARTİYA KOMUNİST A FRANSÊ

*Jı Bo Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê*

*Jı bo 10 saliya Partiya we, em sılavên bırati bı rê dıkın.*

*Em dıxwazın hûn bawerbın ku komunisten Fransız bı xurti pıştgiriya we dıkın dı şere we yê dıj zulm û merkûjiyên diktatoriye, ku hûn bı tevi hêzên gel yên dınê dımeşının, bo nasina hebuna gelê Kurd û bo demoqratiyê.*

*Sekriterya*
*Partiya Komunist a Franse*

## PARTİYA KOMUNİST A BRİTANYA MEZIN

Komita Rêvebırınê

Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê

Hevalên Hêja,

Em bı dılxwaziyek mezın sılavên xwe yên bıratiyê jı we ra dışinın bo pirozkırına deh saliya damezırandına Partiya we.

Tekoşina we dıji zordestiya neteweyi yek jı zor û zehmettıran e. Hun dı bın zulmeke mezın da ne ku wek geleki heqên wa yên mırovi û dêmoqrati ji nayê naskırın.

Tekoşina we, ne tenê bo mafên gelê Kurd e, her usa ji, dı tekoşina dıji imperyaliyê da lı çaraliyê dınê para we heye. İmperyali dıxwaze Rojhılata Navin bıke bındestê xwe û lı wê hin zêtır bıngehên leşkeri sazbıke. Ew bıngehên leşkeri û pıştgıriya imperyaliya Amêrika Yekbûyi bo Cunta Tırkiyê, xeterek mezın e heq û duwerojên hemû gelan.

Em xweş hışyar ın jı mesûliyeta hukumeta xwe ku alikari û pıştgıriya Cunta Tırkiyê dıke. Partiya me, nah şunda ji çıqa jı dest hat wê cehd bıke ku dı nav tevgera karkeran û aştiyê dı welatê me da tesira û pıştgıri bê nişandan.

Partiya Komunist a Britaniya Mezın jı we ra sılavên bıratiyê dışine û serfıraziya cıvina we bı dıl dıxwaze.

**Brayên we**
**GERRY POCOCK**
**Serokê Beşa Karên Dervayi**

www.arsivakurd.org

## Partiya Komunist a Norweç

Hevalên Hêja,

Bı navê Partiya Komunist a Norwecê sılavên germtırin jı we ra tinım, bona 10 Saliya damızırandına Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê.

Partiya Komunist a Norwecê qimetek gelek bılınd dıde tekoşina we dıji neheqi û zordestiyê ku bı destê rejimên zordest lı heremê lı ser mıletê we tê kırın. Ew dewletên ku mêrasa kolonyaliyê hin ji bı rêva dıbın, dest davêjıne her tıştê xırab bo ku Kurdan jı ortê hılinın.

Ez bı navê Partiya Komunist a Norwecê û bı navê xwe dıkarım bêjım ku pıraniyeke xurt a gelê Norwecê, ewê ku dı demeke ne dûr da bo yekıtiya neteweyi mecbûr ma şer kır, gelek xweş fêmdıke ku heqê gelê Kurd jı bı serbesti qedera xwe tayin bıke ew gelê Kurd ku dı kêmahi da xudi dirokek du hezar sal, xudi zımanê xwe yê taybeti û adetên û çandeki cuda ye

Bona vê yekê em jı we ra serketın dıxwazın dı tekoşina we da nah şunda ji.

Randi Solheim Ghilzai

## PARTİYA YEKITİYA SOSYALİST A BERLİNA ROJAVA

Jı bo Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê

Hevalên Hêjayên Kurd,

Em dıxwazın hûn bawer bın ku em komunistên Berlina Rojava, cardın pıştgıriya internasyonali bı we ra nişan dıdın dıji êrişa hovi a nu ku diktatoriya leşkeri û faşi lı Tırkiyê pêk ani, û dıji fend û cıxıziyên imperyaliyê.

Em bı tevi we dıxwazın ku êdi bıla dawiya vê êrişê bê ku dıxwaze gelê Kurd jı ortê rake, û lı Tırkiyê hemû azadiyên siyasi û dêmoqrati jı gelê Kurd ra bê dayin.

Bıji tekoşina dıji imperyaliyê!

Emê pıştgıriya internasyonali bılındkın!

Partiya Yekıtiya Sosyalis a Berlina Rojava
Komita Rêvabırınê

## PARTİYA KOMUNİST A YÛNANÍSTANÊ
### Komita Merkezi

Jı Bo Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê

Hevalên Hêja,

Komita Merkeziya Partiya Komunist a Yunanistanê jı bo 10 saliya damezırandına Partiya we sılavên xwe yên şoreşgeri dışine.

Hûn gelên Kurdıstan û Tırkiyê dı rewşeke dıjwar da, dı bın zulmeke nemırovi, gırtın, lêdan û kuştın da dıji rejima faşi û imperyaliya Amêrika Yekbûyi, bı hevra, bo aşıti, dêmoqrati û rızgariya cıvaki şer û xebat dıkın. Em komunistên Yunan û hemû dêmoqratên welatê me lı cem we ne.

Gelê Kurd bo parastına heqên xwe yên neteweyi û dêmoqrati berxwe dıde dıji cunta faşi a Enqerê ku ew siyaseteke nıjadparêzi dajo bo belavkırına gelê Kurdıstan û helandına wi bı zorê. Partiya Komunist a Yunanistanê dı vê tekoşinê da lı cem gelê Kurdıstanê ye.

Hevalên hêja, daxwazên me yên baştırin qebûl bıkın.

Bı sılavên hevalti.

Komita Merkezi
Ya Partiya Komunist a Yûnanistanê

## PARTİYA TUDEH-İran
### Rêxıstına Swêd

*Hevalên Hêja,*

*Bona 10 saliya damezırandına Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê, emê jı we ra sılavên germtırin dışinın.*

*Partiya TUDEH a İranê, pıştgırtiya we dıke dı tekoşina we yê mêrxas da dıji faşi û imperyaliyê lı Tırkiyê. Em pıştgıriya gelê Kurd dıkın dı şerê wi yê heq da ku ew, bo destxıstına heqên neteweyi bı rêva dıbe.*

*Em, dıji êrişa Cumhûriya İslami, a hukumeta Tırk û a rejimê Baas a Seddam bı xurti derdıkevın û vê êrişê mehkum dıkın ku ew bı hevra dıji gelê Kurd bı kar tinın.*

*Bıji tevgera gelê Kurd!*

*Bıji pıştgırtiya internasyonali!*

*Partiya TUDEH a İran*

# PARTİYA KOMUNİST A TIRKİYÊ
### Komita Merkezi

Jı Bo Heval Kemal Burkay
Sekrıterê Gıştı a Komita Merkezi
Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê

Hevalên Hêja,

Ez jı bo vexwendına we jı ber 10 saliya damezırandına Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê bı dıl sıpas dıkım û bir-baweriyên Partiya Komunist a Tırkiyê yên dostayeti û pıştgıriyê û daxwazên serketınê dışinım jı bo Partiya we dı tekoşina sala 10 da.

10 Saliya Partiya we dı demeke usa dê cih dıgre ku lı dınyayê, lı heremê û lı welatê me xeter bılınd dıbın û tevi wê ji mesûliyeta me yê mıştêrek mezın dıbe.

İro taxıma imperyali ya Devletên Amêrika Yekbûyi (DAY) bı xurti jı diktatoriya faşi a welatê me istifade dıke dı rêvebırına siyaseta xwe yi şerxwaz, êrişker, dıji welatên cinar yên sosyalist - beri hemûyan dıji Yekıtiya Sovyêt - dıji rejimên Ereb yên pêşverû û dıji tevgerên rızgarixwaz ên neteweyi lı heremê. Ew kar û xebat dıkın ku bı riya Tırkiyê tesira NATO'yê fıreh bıkın ber bı Xelicê Besrayê. Sazûmana faşi roj bı roj dı vi wari da gavên nu davêje. Ew kar dıke ku blokên leşkeri-siyasi bên sazkırın lı heremê gora mafên imperyaliyê û sazûmanên kevneperest.

Lı hundur ji, sazûmana faşi welat vedıke bo zêrandın û talana imperyaliyê û mıstek monopolên hevkar û xulamokên wê. Ew, şovıniyê û dıjayetiya komunistiyê bılınd dıke û cardın êrişek har û hovi tine ser tevgera çep û tevgera neteweyi yê Kurd bı taybeti û ser hemû hêzên dêmoqrat.

Rewşa hanê, bı aliyekê sıstiya sazûmana faşi, lı aliyê dınê ji mezıniya xetera pêş me nişan dıde, eger dı waxtê da pêşi lê neyê gırtın. Ew operasyona lı Kurdıstana Tırkiyê ku gıha dereca bombekırın û valakırına gundê Kurdan, ew zulm û zordesti, qırkırın û ew şerê ne ilankıri ku dıji gelê Kurd dı Kurdıstana Iraqê de bı destê leşkerê Tırkiyê tê kırın, hemû bı vê yekê ra gırêdayi ye. Ew beşek e jı plana imperyaliyê bo jı rakırına gelê Kurd bı temami lı heremê û jı dirokê.

Partiya me TKP, dı Kongra xwe yê 5. da tayinkırına qedera xwe, ango heqê cêbûnê û çêkırına dewleta xwe bo gelê Kurd, dı program û wesiqeyên dınê da eşkere kır û nıvisand. Em tevgera neteweyê Kurd wek hevalbendê stratejik dıbinın bo serketına şoreşa dêmoqrati - geli dıji imperyaliyê.

TKP iro, ber bı vê armancê, kar û xebat dıke bo rewşeke dêmoqratik ku gelê Tırk û Kurd lı ba hev wek bıra û bı azadi bıjin.

Em dıji şovınizmê ne, ku dıxwaze jı pêş çavan wında bıke şerê gelê Kurd lı cem gelê Tırk dıji imperyaliyê dı dirokê da.

(Dûmahik Rûpel 15 an da)

www.arsivakurdi.org

# YEKITİ NIŞTIMANİ KURDISTAN *

Hevalên Serkırdatiya Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê

Kadr û endamên xebatkar,
Xwişk û brayên bı rêz,

Bı navê Sırkırdatiya Yekıti Nıştımani Kurdıstan û tev heval û pêşmergeyên xwe, biranina 10 Saliya Partiya we ya xebatkar bı germi piroz dıkın, hêviya bı serketına we dıxwazın dı xebata gıran a gelê me yê qehreman de û dı bıci anina armanc û hêviyên we de.

Lı destpêka salên 20'an de, pıştî wê neksey ku bı ser xebata gelê mede hat, dı parçeya heri gıring (Kurdıstana Tırkiyê), heger ku Kemal Etatırk û rejima dagırkera Tırkiyê, kanı bû jı bo mudeteke kın destê xwe bı ser hereketa rızgarixwazê gelê me de bıgre. Lê gelê Kurd ıspat kır ku ne mıri yê û ew faşistên han çıqasi dın bı hêztır û wehşitır bın, nıkarın hetani seri destê xwe bı ser hereketa mılletek bındest û eşkence lêhati kırın de bıgre. Wê yekê bû ku hereketa nıştımani û demoqratik ya gelê me lı Kurdıstana Tırkiyê de careke dın şıyar bû, lı destpêka salê 70'an de û ber bı geşbûn çû.

.............

Hatına hukma faşist lı Tırkiyê û destkırın hukma urfi dı Kurdıstanê de, Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê, lı hımber vê êrişê de xwe gırt û hetani derekê ji ber bı pêş de çû, û kari bıbe yek jı hêzên esasi lı ser saha Kurdıstana Tırkiyê. Vê yekê serbılındi û dılxweşiya Yekıti Nıştımani Kurdıstan û tev rêxıstınên şoreşgeri û peşketınxwazên Kurdıstanê ye.

Xwişk û bırayên xoşewist,

Yekıti Nıştımani Kurdıstan, her lı destpêka dırûstbûna xwe da baweri bı harikari û hevxebatiya hêzên Kurdıstani yên tev perçan bûye, vê yekê bı şerteke esasi jı serketına xebata gelê Kurd û şoreşa wê ra daniye.

İro hereketa rızgarixwaza gelê Kurdıstan bı qonaxeke pır nazık û tırs te dıçe. Hember planên imperyalizma Amrika û rejimên dagirkerên Kurdıstanê ye ku tev awayi dıxwazın hereketa nıştımani û demoqratik ya gelê me jı bınive rakın. Rejimên dagirkerên Kurdıstanê, heger ku hemberê hev û du bın ji, lê lı ser mesela Kurd yek menfeetê wan heye. Gelek peymanên eskeri û hevkariyê mor kırıne, jı bo nehêştına gele Kurd û jı bın nehêştına hereketa wi.

(...) Eşkere ye ku ev peymana tali ya Iraq- Tırkiyê xeterek pır mezın e lı dıji çarenıvisa gelê me dı herdu perçayên Kurdıstanê de. Herweki em dıbinın ku cendırmeyên faşistên Tırkiyê bı xwasta Iraq û bı keyfa xwe hêrış tine ser axa Kurdıstana Iraqê, gelê Kurd belengaz û derbıder dıkın lı ciyê bav û kalên xwe derdıxın, lı dıji şoreşgerên herdu perçan pılanên xwe bı ci tinın. Eşkere ye ku ev yek dı vê wextê da jı bo harikari kırına rejima Iraqê ye, jı bo kışandına wê ye bo bıkeve nav NATO. Heger fırsendek jı wan re çêbû, Kurdıstana Iraqê bıgrın, bı navê problema Musıl, petrola Kerkuk û serwet û samana welatê me bıdızın. Rejima faşista Tırkiyê tenê bı vê yekê nesekıni ye, belki jı İran ji harikari xwastiye jı vê meselê re.

Jı bo vê ye, hêzên nıştımani û peşketınxwazên Kurdıstan, iro lı hember tecrubeyek pır sext de dıbinın, ku mesleheta gelê me wer dıxwaze em dı mıştewa berpırsiyari de bın. Xetera vê qonaxê û pılanên imperyalizm û rejimên dagirkerên Kurdıstanê bıpivın; dest jı xılaf û dıjayetiyên hev û du berdın, hemberê van pılanan bısekının; jı dıjmın re ispat bıkın ku irada gelê me geleki bıhêztır e jı planên wan; lı beriya jı hev dûr bûn û meşxûl bûn bı karên nabıci, hevkari û hevxebat û tensiqa danina bernameke heri hındık bıkın kevıra bınaxa xebatên pêş me.

(..) Serkırdatiya Yekıti Nıştımani Kurdıstan (...) daxwaziya hevkari û yekıtiya rêzên gel dıke, bı tev û rêxıstınên Kurdıstan û Iraqê re, ku ev yek daxwaza nıştıman e, bo ku hêviya me ev e ku wextên dın bı zerar neçe, tev aliyan dı mıstewa berpırsiyari de bın. Mesleheta gel lı beri hertıştên dın e. (...)

Bıji bir anina 10 Saliya Partiya Sosyalist a Kurdıstan!

Serketın jı xebata gelê me re ye!

Komita Serkırdatiya
Yekıti Nıştımani Kurdıstan

* Jı ber ku sılavname geleki dırêj bû, em hın beşên wê neşırdıkın. Qısmê ku ne hatıne nıvisandın bı nıqte nıqte hatıne nişandan.

# PARTİ DEMOQRATA PÊŞVERÛ

Komita Merkezi PSKT
Heval Kemal Burkay,
Sılavên germ,

Em kêfxweş û serfıraz ın bı dawetname we jı bo beşdariya me dı komcıvina roja damezırandına 10 saliya Partiya we de.

Hevalên me serbılınd ın, bı pêwendiyên bırati, dı nav Partiya me û yê we de. Hêvidarın dı rojêşipêre van pêwendiya xurttır û kûrtır bıkın.

Diyar jı ku hevgırtın û bıratiya Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê û Partiya Demoqrata Pêşverû ya Kurd lı Suriyê dıbe bıngeheki xurt jı bo tevgera welatparêz û pêşverû dı hemi perçên Kurdıstan da û kelemki tûj dı rûyê kevneperest û duruyan.

Mıxabın jı bo me gelek, zehmete beşdariya vê komcıvinê. Hêvidarê serketına we ne.

Bıji biranina 10 saliya PSKT!
Bıji bıratiya Partiya PSKT û PDPKS!

Komita Merkezi
Partiya Demoqrata Pêşverû yê Kurd lı Suriyê

Sekreter
Hemid Derwêş

## PARTİ DEMOKRATİ GELÊ KURDISTAN

Parti Sosyalisti Kurdıstan- Tırkiyê

Bınavê endamên û pıştevanên partıa me (Parti Demokrati Geli Kurdıstan) sılavên şoreşgeri germ pêşkêş dıkın bo endam û pıştevanên Partiye we Partiya Sosyalist Kurdıstan bı bona birhatına dehan ya damezırandına wê. Hêvidarın ev birhatıne bıbite egera xebateke tijtır û mukumtır dı rêya cêbêcekırına armancên gel û pêkanina mafê çarenûsi. Daxwaz û mêrama me ewe ku hıngavên fıreh bêne danin dı riya hevgırtın û nêzıkbûnê da jı bo pêkanina waneyeka(cephe) gıştı lı navbera hêzên pêşkeftixwaz û pêşverû da lı bakûrê Kurdıstanê ku paş bıbite parçeyek jı waneyeka fırewan lı hemû parçên Kurdıstanê de. Da ku bıhêztır û tundtır bıkarın beramber plan û hêrişên dıjmıni rawestin û bı demeke kurttır mafê gelê xwe binine dest.

Êdi pêşkevın dı rêka xebata xwe da û serkeftın û serfırazi her jı bo gelê me yê bındest e.

Parti Demokrati
Gelê Kurdıstan

www.arsivakurd.org

## Partiya Hevgırtına Geli Kurd

Hevalên Hêja,
Em piroziya we dıkın bı yadi dehsalên damezırandına Partiya we- Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê, û hêviya pêşveçûn û geşbûna xebata we dıkın.

Rewşa gelê Kurd û mercên tevgera azadixwaza Kurd iro, erk û barên gıran dıdın ber hemû hêzên Kurd ên welatperwer. Hevgırtın û yekıtiya rêxıstınên pêşverû hıngaveke bıngehiye di rêya çarekırına van kosp û kêşandeli her çar perçên Kurdıstan û lı derve.

Bı vê helkevtê em dıxwazın disa bêjın, weki rêxıstınên hevraman û hevrê vê ermacê zu pêkbinın.
Pirozbe Dehsalê Partiya we,
Bıji yekitiya hezên nıştımanperwer lı Kurdıstan.

Partiya hevgırtına geli Kurdi lı Suriyê
Rêxıstına Ewropa

## TEKOŞİN

Jı Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê Ra,
Hevalên Hêja,
Em 10 saliya avakırına Partiya we piroz dıkın û hemû endamên Partiye ra sılavên germın dışinin. Bo daweta we pır sıpas.
Hevalno,
Çend mehın ku lı Kurdıstana Bakûr pır tıştên gıring çêdıbın. Wek hûn ji dızanın, hukumeta faşist a Tırkiyê, êrişek nu û mezın ani ser gelê me. Ev êrişa hin ji dom dıke. Bı vê êrişe ar disa hêzên "Milis" hatın sazkırın û disa dest bı zagona "Mecburi-İskan" û sûrgûne kırın. Eşkere ye ku, ev êrişa dawi, dıji gelê Kurd, listık û planên nu yên dıjmın nişan dıde.

Cıvina we dı warêki wısa da pêk tê.
Dı rewşeke han da, vazifên nuh dıkevın ser milê hemû hêzên welatparêz û şoreşger û we ji. Em hêvidarın ku dı ve demê da tıştê ku jı deste we bê hunê bıkın.
Bı sılavên şoreşgeri.

TÊKOŞİN

## ALA RIZGARİ

Hevalên hêja,
Dı pirozkırına dehemin (10) sala serboriya damezrandına rêxıstına we ya PSKT de em dê nıkarıbın beşdar bıbın û jı ber vê yekê em geleki xemgin ın. Em hêvidar ın ku hûn ê me bıborın.

Jı roja ku diktatorya faşist i mêtıngehkar dest dani ser hukım hetani roja em têde ne gelek wext buhırı. Dı vê navberê de gelê me zulm û zordestiyên bêhempa û kesendi jiya.

Gırêdayi vê burjuwaziya mêtıngehkar bı dagerandına politika xwe ya abori gelê me yê ku jı berê de belengaz bû, hın bêtır ber bı tengasi û sefaletê de bır.

Ev guherinên lı Tırki û Kurdıstanê pêktên, her ku dıhere dıkeve pesirtengasiyeke dıjwar.

Van mehên dawin dewleta faşist i mêtıngehkar êrışên xwe heta ku jı dest wê were zêde kıriye. Dı van rojên dawin de hın bûyerên lı Kurdıstanê bûn, jı xwe re kır mehne û lı gor dek û dolapên emperyalizmê lı ser navçeyê (mıntıqê) çêkırıne, bı taybeti dı bın serkêşiya emperyalizma ABD, ordiya TC ê êrış bır ser hın heremên Kurdıstana İran û Iraqê.

Dı iroj roja ku hûn dehemin serboriya rêxıstına xwe ya PSKT piroz dıkın, welatê me dı rewşek pır dıjwar û ziz re derbas dıbe. Pêwistiyên ser mılên me barın gıran ın.

Em dıkanın jı bela faşizmê ya ku bı salan jı gelê me re tofan rakıriye bıfılıtının û bı pêwistiyek wusa rabın.

Yek rê jı bona vê heye, ew ji pêkanina yekıtiyên domdar ku kanıbe muhelefeta fırehtırin lı dor xwe tev gırêde.

Dı serboriya dehemên sala damezrandına partiya we de, bı baweriya ku xebatên we dê dı tekoşina gelê me de gavın bı pêşte bın, em sılavên xwe yên şoreşgeri pêşkêşi we dıkın, jı dıl û jı can serfirazi û pêşketına we daxwaz dıkın.

ALA RIZGARİ

## QANATÊ KURDO

Hevalê Eziz Kemal Burkay,
Mın nama te stand, te têda nıvisiye, ku ez bême cıvina we ya 10 saliya damezırandına PSKT.

Hevalê xoşevist, ez geleki jı we razime, ku we pêra layq ditiye gazi mın bıkın. Lê sed heyf, ez nıkarım bêm, eva sê mehın nexweşiya mın dıkşine, ez lı ber emelê (apêrsiya) aza bûme, lê gelek sısk û jar bûme.

Ez bı dıl û can sılavên xwe bırati, komunisti jı cıvina wera dışinım û bı dıl û can dıxwezım cıvina we bı serfırazi derbaz be, hemû endamên we dı hemû pırs û bıryarên xwe da yekdıl û yekdeng bın, bıryarên baş bona pêşvebırına iş û karên partiya we qebûl bıkın, wusan bıkın, ku nav û dengê partiyê lı nav kom û partiyên dınyayê pêşkevtida hê zêde û bılınd bın bona xatırê dosti û hevkariya xebatkar û gundiyê Kurd û Tırk, bo xatırê yekıti û hevkariya wan dı şerê wanda pêşberi stemkariya faşistên Tırk û impêryalistên Amêrika, bona damezırandına rêşpûblika fêdarativ ya Kurd û Tırkan.
Her bıji Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê!
Her bıji dosti, aşıti, hevkari û wekheviya neteveyên Rojhılata Nêzık!
Bı sılavên bırati û şoreşgeri
Qanatê Kurdo

## TEMÛRE XELİL MURADOV

Sekrêterê Gıştı Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê
Kemal Burkay re,
Mın teglifnama we stand. Jı bo wê gelek sıpas. Lê mıxabın, ez nıkarın tevi cıvina we bıbım. Dımine, ku ez bı dıl we piroz dıkım jı bo 10 saliya damezırandına Partiya we û dı kar û barê weyê ne hêsada serketın û pêşketınê bıxwezım.

Temûrê Xelil Muradov

## MAHMUT BAKSİ

Jı Sekreterê Gıştı ya Partiya Sosyalist a Kurdistana Tırkiyê, Kek Kemal Burkay ra.

Deh saliya PSKT, di diroka Kurdıstanê da ciyekê gıring dıgre. Hebûna Partiyê jı bo gelê me û ji bo karker û kedgerê Kurdistanê hêviyekê pır mezın e. Dıvan rojên tari û zehmet te, barê Partiyê êdi ji gıran bûye. Lê ez bawer ım ku, PSKT wê bı serbılındi karûbarên xwe bımeşine. Bê guman ev cara yekemine ku karker û kedgerên Kurdistanê dıbın xwedi Partiya xwe, lı ser rêça sosyalizma ilmi...

Mın dixwest ez bı dıl û can bı were bım û vê roja giranbiha piroz kım. Lê çi feyde...

Deh saliya PSKT, ji gelê kurd û ji karkerên Kurdıstanê re piroz be...
Bı Eviniya mın
Mahmut Baksi
Nıviskar

## GUNDİ

Hevalên hêja,
Endam û hevalbendên Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê!

Zor spasdıkım bo dewetnama we ya gıranbıha. Mexabın rewşa mın rêneda, ko ez dı cıvinê da beşdarbım.

Ez derbasbûna 10 salan di ser avakırna partiya we ra ji dıl pirozdıkım û hêvidikim, ko ev civina bı serfirazi pêkbê û bıgehe armancên xwe.
Gelek sılavên şoreşgeri
Hevalê we
Gundi

www.arsivakurd.org

# DAXUYANİ

Pışti xebata ku jı demeki berê dı navbera partiyên me da tê kırın, dı Çıleyê Pêşin (desembır) sala 1984 da mumessilên serokatiya rêxıstınên me cıvinek pêkanin.

Dı vê cıvinê da lı ser bûyer û guhartınên dawi lı dınyayê, lı Rojhılata Navin û lı Tırkiyê hat sekınandın. Dı dawiya vê cıvinê da partiyên me bıryar gırtın ku hêzên xwe yek bıkın dı têkoşina dıji faşiyê û imperyaliyê da û bı navê Yekıtiya Hêzên Çep a Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê (YEKTİYA ÇEP) hevkariyek avakırın.

Partiyên me deklerasyonek derxıstın û tê da kar û bar û armancên YEKİTİYA ÇEP eşkere kırın. Her usa ji, ruxandına rejima faşi wek armancê nêzik lı pêş xwe danin û bona vê yekê programeke dêmoqratik amade û eşkere kırın ku daxwazên hemû hêzên dêmoqrat têda ci dıgre û hevkariya wan dıxwaze bo aşıti û dêmoqratiyê.

Partiyên me ku YEKİTİYA ÇEP pêk anin, her usa ji, bıryar dan ku daxuyaniya jêrin jı xelkê ra eşkere bıkın:

Hêzên imperyaliyê yên heri kevneperest, dı serokatiya wan da imperyaliya Dewletên Yêkbûyi ya Amêrika (DYA), iro zor dıdıne siyaseta xwe ya geni bo safikırına pırsên navnetewi bı darê zorê, bo zêtırkırına çekên nukleeri, kimyevi û konwansiyonel û bo pêşilêgırtına tevgera bêçekbûnê û aşıtiyê, û dınyayê bı şereki nukleeri dıtırsinın. Lı DYA jı nu va hılbıjartına Reagan bo serokcûmhûriyê, vê xeterê mezıntır dıke. DYA, wek dagırtına Grenada, hazıriya xwe dıke bo ruxandına hukma şoreşger lı Nikaragua bı darê zorê.

Bona vê yekê, iro wezifê heri gıring bo hemû gelan ev e ku, dıji vê siyaseta imperyaliyê ya êrişker derkevın, hêzên şerxwaz bıdın seknandın û paşta bıdın, dınyayê û hemû insaniyê jı bêtara şereki nukleeri bıparêzın. Em, bı hemû hêza xwe pıştgıriya kar û xebatên hêzên aşıtixwaz dıkın lı temamiya dınyayê û dı nav vê tevgerê da ciyê xwe dıgrın.

Mıntıqa me Rojhılata Navin iro ji wargeheki şer û pevçûnan e jı ber berdewamiya êrişên imperyali û siyaseta kevneperestên heremê ku hevalbendi û xulamiya wan dıkın. Hêzên imperyali û İsrail, dıxwazın pılana xwe yê kevneperest dı derheqa pırsa Fılıstinê bı kar binın, bı alikariya rejimên kevneperestên Ereb. Em dıji vê plana kevneperest ın û bo heqê gelê Fılıstinê, çêkırına dewleta serbıxwe dı erdê xwê da, kar û xebat dıkın.

Em dıxwazın, şerê ku dı navbera Iraq û İranê da berdevam e û tenê bı kêri imperyaliyê tê êdi bıgehe dawi û pıştgıriya hêzên pêşverû û gelên van welatan dıkın ku bo demoqratıyê û heqên cıvaki şer dıkın, û her usa ji, pıştgıriya gelê Kurd dıkın ku bo heqên neteweyi û dêmoqrati şer dıke lı van welatan.

Rejima faşi ku çar sal e lı ser gelên me zulm û zordesti dıbarine, hımber ewqas derewên xwe, jı insanên me ra, jı bırçıti û betaliyek fıreh, û pêrişaniya abori û cıvaki bêtır tıştek ne ani.

Rejima faşi welatê me bı imperyaliyê ra zêtır gırêda bı aliyê abori, siyasi û leşkeri. Hukumeta Ozal ku wek kahyayê saziyên abori yên navnetewi kar dıke, welat ber bı kambaxiya abori dıbe. Rejima faşi welatê me kır êrişgehek bo imperyaliya DYA, dıji welatên cinar û tevgerên rızgarxwaz. Ew lı qıbrısê, lı Behra Egê û lı sinorên rojhılatê dıjayetiyan kûr dıke, siyasetek dagırker û maceraperest dımeşine.

Eşkere ye ku cotê Evren-Ozal siyaseteke dıji gel û aşıtiyê dımeşinın. İro xelk rûyê wani reş çêtır dıkarê bıbine. Cunta û hukumeta wê ya totık pıraniya gel jı xwe ra kıriye dıjmın û tenê bı darê zorê hukma xwe dımeşine.

Cunta ketiye tengasiyê û hımber vê, xwe bı imperyaliya DYA ra zêtır gırêdıde û lı ser gel zordestiyê gıran dıke, kıryarên han jı halê xwe ra wek çare dıbine. Ew manekırına bûyerên sinor û destpêkırına teroreke nu lı Kurdıstana Tırkiyê, êrişbırına wi ali sinor, gırtına bı hezaran kesên nu, vekırına daweyên nu dıji endamên Komela Aşıtiyê û ronakbiran, cezayên nu bo dardakırınê û bı ci anina wan, vê yekê baş nişan dıdın. Cûnta, berekiva bı derew û fortan "welat dı xetera parçebûne da" nişan dıde û bala gel dıkışine ser pırsên han, şovıniyê bılind dıke, lı ali dınê ji, êrişên nu tine ser hêzên çep û hêzên dêmoqratên dın.

Lê çı heye ku ev kıryarên han ji nıkarın Cûntayê jı têkçûnê bıparêzın. Dıgel vê, rejima faşi wê bı xwe û xwe

Dûmahik Rûpel 15 an da

## RÊXISTINÊN KU MIMESIL Û MESAJ ŞANDIBÛN

### Rêxıstınên Ku Mımesilên Xwe Şandıbûne Cıvina Kolnê

Partiya Komunist Alman (DKP); Partiya Karkeran a Sosyalist-Tırkiyê (TSİP); Partiya Komunist a Şoreşger (Halkın Kurtuluşu); Proleter Dayanışma (THKP/C-HDO); Şoreşgerên Kurdıstan.

### Mehvanên Ku Dı Vê Cıvinê da Beşdar bûn

Kemal Uzun (Seknıterê Gıştı ya TOB-DER); Melike Demirag (hozan) Şanar Yurdatapan (kompozitor); Aydın Yeşilyurt (mımesilên DİSK a lıqê 7'a); Selahattin Uyar (serokê duwemin a Sendikata TEKSTİL).

### Rêxıstınên Ku Mımesilên Wan Dı Cıvina Stokholm Da Beşdar Bûn

Partiya Komunist Norweç; TUDEH (rêxıstınê Swêd); Yekıti Nıştımani Kurdıstan; Parti Demoqrati Geli Kurdıstan(Iraq); Komela (İran); Parti Demoqrata Pêşverû ya Kurd lı Sûri; Partiya Hevgırtına Geli Kurd lı Sûri(rêxıstınê Ewrupa); TKP; PPKK; TKP-B; Kurtuluş; Emeğin Birliği.

### Rêxıstınên Ku Mesaj Şandıbûn

Partiya Sosyalist a Avustralya; Partiya Yekıtiya Sosyalist a Berlina Rojava; Partiya Komunist a Britanya Mezın; Partiya Komunist a Franse; Partiya Sosyalist a Pêşverû Grubê Parlamenê lı Hollanda; Partiya Karkeran a Komunist Swêd (APK); Partiya Komunist a Iraq; Partiya Komunist a Sûri; Partiya Komunist a Norwec; Partiya Komunist a Yûnanistanê; TUDEH; Partiya Komunist a Tırkiyê; TKP-B; TKEP; Emegin Birligi; Ala Rızgari; KUK; PPKK; Kurtuluş, Tekoşin; Şoreşgerên Kurdıstan, Parti Demoqrati Geli Kurdıstan; Yekıti Nıştımani Kurdıstan; Partiya Hevgırtına Geli Kurd lı Sûriyê; Parti Demoqrata Pêşverû ya Kurd lı Sûri, Gültekin Gazioglu (Serokê TOB-DER); İnfo Turk (Dogan Ozguden); Gerçegin Sesi-Londra.

### Kesên Ku Mesaj Şandıbûn

Kemal Daysal (endamê Komita Navbendı ya DİSK), Yaşar Arıkan (endamê Komita rêvabırı Gıştı ya DİSK), Aydın Yeşilyurt (mumesilê DİSK a lıqê 7'a); Mahmut Baksi (Nıvıskar), Gundi (helbestvan) Qanatê Kurdo (Prof-nıvıskar); Têmûrê Xelil Muradov( Nıviskar).

www.arsivakurd.org

# LI SER XEBAT Û JİYANA CİGERXWİN

Seydayê Cigerxwin dı 22'yê Çıriya Pêşin da(Oktobır) emrê xwe temam kır. Ew merıvê jirek, bawermend, dılgerm jı jiyanê weda kır. Lê merıv nıkare bêje Cigerxwin mıriye. Ew bı laşê xwe vegeriya axê, lê bı şıêrên xwe, bı birûbaweri û tekoşina xwe dı dılê gelê Kurd da, dı xebat, dirok û çanda gelê Kurd da wê her bıji. Cigerxwin bı xebat û efrandınên xwe zora mırınê bırı bû .Merıvên wek Cigerxwin nemır ın.

Dıvê em bı dû Cigerxwin şinê nekın. Wi emrê xwe vala darbas nekır; wi çı jı dest hat kır, karê xwe pêk ani û dı emreki kamıl da çû. Dıvê em bı wi serbılınd bın; qimeta wi, mezınahiya wi baş bızanıbın û ew bıbe rêberek baş dı jiyan û tekoşina me da nah şunda ji.

## Hın Ruçıkên (wesfên) Seydayê Cigerxwin

Mezınahiya Cigerxwin jı çı pêk tê? Gele rûçıkên mırovi yên bılınd dı şexsê Seyda da kom bıbûn: Wek jireki, fıdakari, bawermendi, nefspıçûki.

Seyda jirek bû. Wi 81 salê emrê xwe bı xebat û tekoşin derbaskır. Heya roja mırınê dev jı kar berneda. Heya roja mırınê ji nıvisand, got, jı der û dorê xwe ra, jı hêzên welatparêz û şoreşger ra rê nişan da. Ew dı rojên dawi da ji dı cıvinan da, dı meşinan da bı mera bû. Ew bı kar û xebat şa dıbû, serfıraz dıbû.

Seyda merıvek fıdakar bû. Wi jiyana xwe, kar û xebata xwe da bo rızgariya gel û welat, da bo rızgariya bındestan. Tucar jı vê poşman nebû.

Seyda merıveki bawermend bû. Dı emrê xwe da şıkestına gele serhıldanên gelê Kurd dit. Gele kesan dı niyê rê da dev jı kar berdan. Wi dı diroka gelê me da wek mêrxasi û berxwedayini, misalên sıstiyê, bêqiretiyê û ixanetê jı gelek ditın. Wi jı dıjmın gelek teda û zordesti dit, gele caran hat gırtın; malbata wi gelek feqiri û cefa kışand. Kevneperestên Kurd ji pırcaran ew êşandın Dıgel vê hın caran, merıvên ku Seyda bo wan şer dıkır, bındestan ji guh ne dıda gotınên wi, tê nedıgihiştın. Lê bawermendiya Seyda bı van tıştan ne şıkiya, dılê wi tucar sar nebû. Wi dev jı şer berneda, dı riya xwe da ajot.

Çıma hın kes şer nivçe dıhêlın? Çıma hın kes dı nivê rê da dıwestın, dev jı xebata welatparêzi û şoreşgeri berdıdın û heya dawi nameşın? Sedem ev e ku, ew kes, hımber êrişên dıjmın diyax nakın; hımber teda û zehmeta sıst dıbın. Sedemêk dınê ji ev e ku, ew kes ne xudi bir û bawerıyek xurt ın. Qanunên cıvaki baş nızanın. Wexta dıjmın lı wan zor dıke, wexta serhıldanên gel dışkên, bê hêvi dıbın.

Lê merıvên ku dirokê û qanûnên cıvaki baş dızanın hêviya xwe wında nakın. Ew dızanın ku zordesti ne bê dawi ye. Duweroj, bıbê nebê ya bındestan e.

Seydayê Cigerxwin çawa diroka gelên dınê û ya gelê Kurd baş dızanibû, her usa ji felsefa materyalizma diroki baş tê gihiştıbû. Baweriya wi bı sosyalizma ilmi hebû. Hostayên materyalizma diroki eşkere kırın ku hertışt dıguhre û berbı nujeniyê dıçe. Duwerojê insaniyetê ya karkeran e, bındestan e. Pıştı sazûmana sermiyandari sosyalizm wê bê û hemû insana rızgar bıke, zordesti û zêrandınê yekcar rake. Şoreşa Oktobrê lı Rûsiya û şoreşên pıştı wê ew yek ıspat kırın.

Seydayê Cigerxwin nefspıçûk bû. Çawa xelk dıbêje, mezınan ra mezın, pıçûkan ra pıçûk bû. Pozbılındi, qureti lı ba tûnebû. Jı her fırsendê istifade dıkır, bir û baweriyên xwe belav dıkır, dıxwest insanan bıgıhine. Bona vê yekê ji insanan jê hezdıkırın, jê ra hurmet dıkırın.

Hın kes hene jir ın, jêhati ne, lê pozbılınd ın. Pozbılındi merıvan mezın nake, pıçûk dıke. Merıvên han insanan, dostan, heval-hogıran lı dora xwe nacıvının, lê dırevının.

Ew rûçıkên han ku lı Cigerxwin kom bıbûn, dıbûn nişanên mezınahiya wi. Tevgerên gelan hewcadari merıvên usa ne: merıvên jirek, fıdakar, bawermend û nefspıçûk. Dı riyên dırêj û çetın da ew kesana dıkarın rêberiya gel bıkın.

## Seyda Kurdeki Xas Bû

Seydayê Cigerxwin insanên me, rabûn û rûnıştana gelê Kurd, adetên gel baş nasdıkır. Dı dema feqitiyê da gund bı gund lı Kurdıstanê geriya bû. Bona vê yekê baş têgihıştıbû zmanê gel, gotın, klam, çirok û hemû dewlemendiya wê.

Her usa ji seyda derheqa dirok û edeba Kurdi da gelek xwendıbû. Ew, jı nıviskarên me yên kevn û hêja ra wek Eli Heriri, Melayê Cıziri, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xani û yên dın ra, jı merıvên mezın wek Selaheddini Eyûbi ra, jı qeremanên gel wek Rıstemê Zal û Guhderz ra xudi derket; dı şıêrên xwe da ciyek bılınd da wan. Bona wê yekê şıêrên Seyda tesirek baş kır lı ser gelê me bir û baweriyên welatparêzi xurt kır. Ew bı riya şıêrên Seyda bı dirok û çanda xwe hışyar bû û serbılınd bû. Propagandê dıjmın derheqa dirok û çanda me da şıkiya, pûç bû.

## Seyda Xwe Nuh va Dıkır û Pêş va Dıbır

Seyda adet, zman, çand û diroka gelê me çawa baş dızanı bû û bı tıştên hêja ra çawa xwedi derdıket, her usa ji hın adetên kevn û pûç ku êdi bıbûn bendek lı lıngê gel û ne dıhişt gelê me bı aliyê cıvaki pêşva bıçe, dıji wan derdıket.

Olperesti dı dest kevneperestan da bendeki usa bû. Kolıdarên ku gelê me bı bend kırıbûn, mir, axa û şêxên ku lı ser pışta gel rûnıştıbûn û ew dızêrandın, ne dıxwestın gel hışyar be, ne dıxwestın karker û gundi çavê xwe vekın. Ewana ol(din) ji dıkırın hevcarek bo xapandına gel. Ewana erd bı çoyê zorê, bı neheqi jı dest gundiyan gırtibûn, lê dıgotın xwedê ev erd daye mir û axan. Ewana xebatkar tazi dıkırın, bırçi dıhıştın, lê dıgotın dewlemendi ji, xızani ji bı desti xwedê ye.. Ewana hemû xırabiyên xwe nişan dıdan wek karê xwedê.

Seyda dıji derewên wan derket. Wi bı camêri perdê derewan çırand û rasti eşkere kır. Seyda riya dırıstiyê, qenciyê, aşıtiyê nişan da.

Mebe olperest ey hevalê delal
Bı her kesre rast û dırıstbe heval

Çı tıştên derew bın tu dûri here
Were em bı hevre herın pêş, were!

Çı tıştê neqenc bi şerê wi bıke
Heçi qence herdem tu her wi bıke

Nebe dostê xwar û peyayê neyar
Tımi dost û yar be jı bo ê hejar.
(Zend Avısta, r. 120)

Seyda dıji zordesti û neheqiya lı ser jınan bı xurti derket. Wi nişan da ku eger jınên Kurd ji wek mêran dı karên cıvaki da ciyê xwe negrın, tevi karên siyasi nebın û bo azadiya gel û welat tevi mêrê xwe şer nekın, hêza me nivnivê wê kêm be.

Tesira jınan lı ser zarokan zêdêtır e. Ew dıkarın zarokan bıelımının bo armancên baş û bılınd, bo azadi û serfıraziya gel. Bona vê yekê dıvê ew ji hışyarbın, dı nav xebatê da bın. Jına nezan pır caran dıbe asteng lı pêş mêrê xwe û karê wi ji sıst dıke.

Bona vê yekê, wezifeyek gelek gıring e bo welatparêz û şoroşgerên Kurd ku ew bend û qeydên hani şaş bışkinın, bı xwe pêşengi bıkın, jınên Kurd binın nav kar û barên cıvaki, tevgera siyasi.

Jın û mêr bı hevre dı nav karde bın
Derê dewlemendi lı me dê vebın

→

www.arsivakurd.org

Qerêja hezar sal û kevneperest
Dı iro jı bo me meke mal û rıst
(Zend-Avısta,r.108)

Cigerxwin berê xwe gıhande bir û baweriyên welatparêzi, dıji dili û bındestiya gelê Kurd derket û dengê welatparêziyê bı xurti bılındkır. Pır ne bori, Seyda xwe gihande bir û baweriyên sosyalizmê. Seyda dı jiyana xwe da gele serhıldanên Kurdan ditın. Her usa ji wi dı çaxê xwe da Şoreşa Oktobrê a mezın û şoreşên dınê ditın, pışti şerê duwemin. Wi baş fêmkır ku rızgariya neteweyi tıştеki gıranbuha ye, gelek hêja ye, lê ne bes e. Bı avakırına sosyalizmê gel dıkare jı bındesti û zêrandınê bı temami xılas bıbe, serfıraz bıbe. Seyda da ser şopa Marksi-Leniniyê bû şervaneki xurt bo rızgariya karker û cotkaran.

## Welatparêzi û Enternasyonali

Şıêrên Seyda da welatparêzi û internasyonali, herdu ji bı xurti xwe nişan dıdın, bı hevra keliyan e.

Hın kes iro ji pêvendiya welatparêzi û internasyonaliyê, pêvendiya şerê rızgariyê û ya sosyalizmê baş fêm nakın, ewana jı hev dûr dıbinın. Xasıma kesên bûrjûwa, xudi sermiyan, kesên dewelemd ku dıj sosyalizmê ne, diwareki dıkın navbera welatparêzi û sosyalistiyê. Lê bo xebatkaran ne usa ye. Xebatkarên hışyar baş dızanın ku ew herdu bı hevra xurti gırêdayi ne. Bo rızgariya welat û bo azadiya gel, dıvê şerê rızgariyê bı serkeve, pêşva bıçe, bı sazûmanek sosyalisti temam bıbe.

Kesên bûrjûwa û kevneperest gelan jı hevdu ra wek dıjmın nişan dıdın. Lê rasti ne usa ye. Dıjmınahi bı deste kolıdaran, kevneperestan dıkeve nav gelan. Bı rasti ew dostê hev ın. Karker û cotkar ne dıjmınê hev ın. Lı çar ali dınê mafê wan yek e, dıjmınên wan lı her derê axa û sermiyandar ın, hukumetên wani zordest ın. Dıvê karker û cotkar, dıvê hêzên pêşverû lı çarali dınê pıştgıri û alikariya hevdu bıkın.

Cigerxwin bı vê yekê gelek hışyar bû.

Cigerxwin hozaneki şoreşger bû. Dengê wi bû dengê şoreşê, dengê serhıldanê. Her usa ji Cigerxwin mırovhız(humanist) û aşıtixazek xurt bû.

Ew dı şıêrên xwe da gelek behsa şer dıke. Behsa tıfıng û topan, teqina dınamêtê dıke. Ev şer şerê rızgariyê ye, heq e, hewce ye bo azadiya gel. Weki dın bend û qeydên kolıdaran, nirê zordestan nayê şıkandın. Lê Cigerxwin mırovhız e, aşıtixwaz e. Ew dı navbera gelan da, dı navbera reşık û sıpiyan da ferq nabine. Dıxwaze ew hemû azadbın û bı hevra wek xwişk û bıra bijin.

Ez xweş mırov ım
Ne hurç û hov ım
Lê çıbkım bê şer
Dıjmın naçi der

## Cigerxwin Dı Karê Siyasi Da Gihışti Bû

Yekjı wesfên Seydayê Cigerxwin ê hêja ji ev bû ku Seyda, dı warê siyasi da ji gihiştıbû. Ev yek dıbe ku bala kêm kesan kışandıbû. Seyda çawa xwe gihande bir û baweriyên welatparêzi, dest pê kır dı karê komelayeti da cih gırt.

Wi salên dırêj dı Partiya Dêmoqrati Kurd lı Suri da (nıha Parti Demoqrat û Pêşverûyên Kurd lı Suri) xebat kır. Seyda hozaneki bı nav û deng bû. Pır kesan jê ra dıgotın "Seyda, hemû welatparêz jı te hezdıkın, tu dı partiyekê da nebi çêtır e.." Lê Seyda guh neda gotınên han. Wi baş dızanıbû ku gelê me bı xebata siyasi dıkare zora dıjmın bıbe, bı serkeve. Bo xebata siyasi ji parti hewce ye.

Seyda usul û erkanên xebata siyasi baş dızanıbû, baş guh dıda wan. Bı nav û dengê xwe tucar pozbılınd nebû. Eger raya wi cudabana ji, guh dıda bıryarên organên Partiyê, dı 80 salê xwe da ji bı tore û disiplin kar dıkır.

Seyda dı gele şıêrên xwe da behsa gıringiya xebata siyasi û rêxıstıni dıke. Dı şıêra xwe yê bı navê "Partizani" da usa dıbêje:

Bıbe parti û hem bıbe partizan
Eger serbılındi dıxwazi, bızan

Nıkari bıbi serbılınd, navgıran
Heta ko dı şer nebi wek beran
(Zend-Avısta, r. 57)

## Cigerxwin Lı Pêş Me Rêberek Hêja Ye

Merıvek wek Seydayê Cigerxwin dı nav mıletan da kêm dıghên. Dıvê em qedr û qimeta wi baş bızanıbın. Jı jiyana wi, xebata wi, bawermendiya wi dersê bıstinın. Em bawerın ku welatparêzên Kurd, şoreşgerên Kurd, nah şunda ji jı Cigerxwin gelek tıştan wê hinbın; wi jı xwe ra bıkın rêber dı jiyan û xebata xwe da.

Seydayê mezın rojên azadiyê bı çavên xwe nedit. Lê tucar hêviya xwe wında nekır. Dıgot, eger ez nebinım ji zarokên mın, neviyên mın wê bıbinın. Wi dı şer da para xwe bı xurti bı ci ani. Dılê wi rehet bû û ew dıkare dı gora xwe da bê xem razê. Law û keçên Kurd doza wi wê bıbın heya seri. Ewê Kurdıstanê rızgarkın, ber bı pêş bıbın.

Û dı vi şeri da Cigerxwin wê tım dı dılê me da be, şerê me da be. Em wi birnakın.

## AXAFTINA HEVAL K. BURKAY

(Destpêk Rûpel 5 an da)

Dıvê hêzên demoqratik û aşıtixwaz lı hemû dınyayê hımber vê hovitiya nu bêdeng neminın.

Ev rejima kolonyali heya iro jı gelê me ra tu heqeki netewi û dêmoqrati nas nekır; zımanê me, heya kılamê me ji qedexe kır û jı me ra zulm û zordestiyê bêtır tıştek ne ani; ne heqê wê ye ku berxwedana gelê me wek haydûti nişande. Rasti ev e ku ew rejim bı xwe zordest e, cerd e, û xwinxwar e. Berxwedana gelê me dıji vê zordestiyê, bı çı şıkli dıbe bıla bıbe, heq e û lı ci ye.

Ew hêzên zordest ku welatê me dı nav xwe da parçe kırıne û dıxwazın gelê me bıkın dil, çı dıkın bıla bıkın, nıkarın jı berxwadana gelê me xılasbın. Ew êrişgeri her usa ji tırs û xofa wan nişan dıde. Ew tırs û xof ji qireqira Evren û Ozalê zordest, jı gotınên hemû berdevkên wan û jı lez û beza rojnamên boyaxkıri xweş tê xuyakırın. Tırs û xofa wan lı ci ye. Ew baş dızanın curmê wan mezın e û gelê me dıji wan bı rıq û hêrs e.

Û tıştê ku ew jê dıtırsın wê bê serê wan. Gelê me zıncirên bındestiyê wê bışkine û dı welatê xwe da jiyanek nu û bextewar wê avabıke. Ew roj ne dûr ın.

Hevalno,

Eger em dıxwazın riya azadiyê kurt bıkın, dıvê em xwe şaşnekın, ber bı armanca xwe dı riya rast da bı bir û baweri û bı gavên pêt bımeşın. Dıjmın iro çıqa xurt xuya dıke bıla bıke neheq e û bıbê nebê wê şer wındabıke.

Ev rejima faşi ku çar sal e jı gel ra zordesti, bırçiti û betali bêtır tıştek ne ani êdi rıziyaye. Ew êriş û macerayên nu dawiya wê nêzıktır dıke.

Serketın bı yekıtiya hêzên wêlatparêz û bı serhıldana gel wê bı destkeve. Bona vê yekê dıvê em bo hışyarkırın û rêzkırına gel û bo yekıtiya hêzên welatparêz karê xwe pêşva bıbın.

Bo ku em Tırkiyê û Kurdıstanê dı bın lepê faşiya zordest xılaskın dıvê em bo yekıtiya hemû hêzên dıj faşiyê karê xwe pêşva bıbın.

Em van karana dıkarın bı destê rêxıstınekê pêkbinın, rêxıstıneke tekoşer, xudan disiplinek pola û dıkare rêberiyek rast bıke jı gel ra. Parti hêviya gel e, çekê gel e, duwerojê gel e. Partiyê xurt bıkın.

Bona temamkırına 10 salên Partiyê hemû hevalan bı dıl piroz dıkım. Rêxıstın û kesên dost û bıra ku dı roja hanê da jı me ra pıştgıri nişan dan, jı wan ra spas dıkım.

Ew hevalên ku jiyana xwe dı riya rızgariya netewi û sosyalizmê da dan, endamê Komita Merkezi hevalê hêja Mustefa Budak, Mıstefa Çamlıbel û yên ku dı zındanên faşizmê da bı mêrani serê xwe dan, wek Metin Aksoy û Yılmaz Demir, û bı dehan hevalên dınê, bı rûmet tinım bira xwe. Emê ala wan lı jor bımeşinın.

Bıji tekoşina me bo azadi, dêmoqrati û sosyalizmê!

Bıji Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê!

www.arsivakurd.org

# PLAN Û RÛREŞİYA CUNTA FAŞİ

Cûnta Faşi, jı çar salan vır da, dıgel ewqas zulm û zordesti ji ne giha armanca xwe. Tu derd û dewayek welat safi nekır, jê ra çare nedit. Ew jı berê gırantır bûn. Gel ji generalên faşi, jı parlamen û hukumeta totık ne raziye dıji wan heya qırtıkê tıje bûye. Cûnta Faşi jı vê yekê gelek acız dıbe, dıtırse.

Cûnta faşi zêtır acız dıbe jı kar û barê derveyi welat ku bı destê welatparêz û hêzên dêmoqrat tê kırın bo eşkerekırına zulm û zordestiya wê bo pıştgırtiya hêzên aşıtixwaz û azadixwaz lı Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê. Ew xebat ci lı Cûntayê teng dıke, xewa wê dırevine.

Çend caran, serokê hukma faşi, General Ewren, acıziya xwe jı vê kar û xebatê ra nişan da got, "Emê dı nêzıkê da şani wan bıdın!"

Jı çû va xuya bû ku Cûnta faşi hın planên nu çê dıke dıji hêzên welatparêz û dêmoqrat ku kar û xebata wan lı derveyi welat bışkine, wan bê rûmet bıke. Me ew yek dı rûpelên Riya Azadi da çend caran eşkere kır.

Nuha plan û dezgeyên Cûntayê serê xwe nişan dıdın.

Sefirê Tırkiyê a Londonê jı Komela Efê ra (Amnesty) dıbêje ku Partiya me PSKT hêzêke têrorist e, lê xwe vedışêre!

Rojnama *Hurriyet'* ê dı hejmara 26'ê Çıriya Paşin (meha 11) da xeberek derkır. Tê da, Sekrıterê Partiya me Heval Kemal Burkay, tevi gelek kesên dın lı Sûri tê nişandan. Rojname, Partiya me ji wek "Partiya Komunist a Kurdıstanê" bı nav dıke, dı nav têrorê nişan dıde û Sûri ra gırê dıde..

Rojnama Hurriyet, xuyaye ew malûmat jı MİT'a Tırkan stendiye û bı daxwaz û izna wan dınıvise. Ew ji, Cûnta faşi bı xwe ji, Heval Burkay lı kiderê dımine û dı kijan partiyê da ye, helbet baş dızanın. Dıji Partiya me lı Tırkiyê gelek dawe vebûn û bı sedan kes heya iro cezayên gıran gırtın. Lê Cûnta û rojnameyên wê dıxwazın bı van derewan avê bışêlinın.

Derew û planên Cûntayê lı dawiya meha 11 zêtır eşkere bû: Roja 23'yê Çıleyê Pêşin lı Elmaniya Federal, bajarê Munsterê, nıvê şevê lı ber deriyê Konsolosê Tırkan qumbelek teqiya. Kesek nehat kuştın û bırindar nebû. Çend rojan kesek jı ve kari ra xudi derneket. Lê 4-5 rojan şunda, weki gotına BBC, yeki jı BBC'ra telefon vekır, jê ra got ku ew endameki "Komandoyên Canfıda"ye û ew rêxıstın gırêdayi Heval Burkay e. Qumbele bı destê wan hatiye danin.. BBC ji ew xeber belav kır.

Heval Burkay, çawa ew xeber bıhist, lı BBC geriya û jı wan ra got ku eleqeyek Partiya me bı vê bûyêrê tune. Jı xwe, bı navê "Komandoyên Canfıda" rêxıstınek me ji tune ye. BBC ev xeber ji belav kır.

Gelo ki bı navê me telefoni BBC bıke û dereweki usa çê bıke? Xuyaye ku ev tışt bı destê konsolos û polêzê Tırkan bı xwe hatiye çêkırın. Hin mehki berê jı neşıreta Rojnama Hurriyet'ê xuya bû ku Cûnta lı dû hın plan û dezgehan e. Teqina wext û ciyê qumbelê ji vê yekê xweş nişan dıde. Weki xebera rojnameyan, ew pışti nıvşevê dı saet sısêyan da û lı ber deri dıteqe. Ango usa ku tu zırarê nede kesi..

Pışti ji curmê davêjın ser me ku navê Partiyê û navê hevalên me xerav nişandın, polêzên welatên xerbê bajon ser me, pêşi lı xebata me bıgrın lı dervayi welat..

Lê ev yek tırsa wan û acıziya wan nişan dıde. Ew bı kırınên han nıkarın dınya alemê bıxapinın, zulm û zordestiya xwe lı ser gelê Kurd veşêrın û navê welatparêzên Kurdan xerav bıkın. Ew bı kırınên han xwe zêtır rûreş dıkın.

Eger polêzê Elmaniya Federal, mıja ser vê bûyêrê belavke û kê ev tışt kıriye eşkere bıke, em gelek razi ne. Lê çı heye ku hukumeta Elmaniya Federal û polêzê wê bı Cûnta Faşi ra kar dıke, dıde û dıstine, gelek pisi û qırêjiyên wê bızane ji eşkere nake..

Jı şevıtandına Rayştag'ê dı dema Hitler vır da, dı usula xebata kevneperest û faşistan da pêkanina plan û dezgelên han ne kêm ın. Dıvê em nah şunda ji dıji plan û dezgeyên wan gelek hışyarbın. Xuyaye ew bı vê yekê nasekının.

## DEWA PSKT LI ELAZİZ ÇÛ DAWİ

Dı meha Çıriya Paşin (meha 11) da dadıgehên (mehkemên) Cûnta Faşi disa cezayên gıran dan.

Lı Elazizê Dadıgeha Leşkeri a 8 an, dı dewa PSKT (Riya Azadi) da 17 welatparêz dı navbera 4 û 10 salan cezakır.

Hayrettin Kılıçgedik, Alaaddin Aras, Şêx Haydar Yalkın, Fevzi Dogan, Mustafa Birden û Mehmet Akif Duran bı 5 salan, Şaban Bazencir Yusuf Yılmaz, Haydar Kûçûkagaoglu, Abbas Sezgin, Seracettin Sarı, Mûslûm Gokçe bı 4 salan, Avni Kişın, Sabri Serin, Selim Seyhanogulları û Bilal Aksoy bı 6 salan, Ali Baltaş ji bı 10 salan hatın cezakırın û dı gel vê cezayan, bı demên cuda cuda hatın cezayên surgun kırın û dı karên ûmûmi da hatın menkırın.

Cûnta Faşi dı dema, ku hate ser hukım, heta nıha lı sûkan, dı bın teda û lêdanan û dı zındanan da bı sedan welatparêz û şoreşger hatın kuştın. Dı gel wan ji, bı destên dadgıhên Cûnta Faşi cezayên gıran -heta dardakırınêtên dayin.

Lêdan, zulm, eziyet û darxıstınên kolonyalistan, ku bı sedsalan berdewamın, têkoşina gelê me, ku her tım pêşta dıçe, nekari bıde sekınandın. Têkoşina gelê me yê Kurdıstan bo Azadi, Dêmoqrasi û Sosyalizmê ber bı pêş dıçe.

Gelê me wê rojek bê, lı wan rêbıran hesabê bıpırse. Ev roj ne dûr ın!

www.arsivakurd.org

## Me Deh Saliya Partiyê
( Destpêk Rûpel 2 an da )

hat nişandan. Axaftın bı alikariya dia (resımên ku bı aliyê roniyê lı ser perde tên nişandan) û şıêran hat xurtkırın û xemılandın. Dıgel vê, programeke dewlemend a çandi jı sêrkaran ra hat nişandan. Koroya keç û xortan marş û kılamên şoreşger xwendin. Hozanên gelêr kılamên şoreşger û gelêr gotın. Def û zırnê lêxıst û komıkên govendê jı çarali Kurdıstanê leyistıkên me nişandan. Carcara salonê bı sloganên şoreşgeri deng dıda.

Dı şeva Stokholmê da ku dı 17'ê Çıriya Paşin da pêk hat, salon devdevi tıje bû û nêzi 600 kes insan amade bû Tevi heval û hogırên me, mumessilên rêxıstınên dost jı Kurdıstanê û Tırkiyê, gelek kesên pêşverû jı Kurd, Tırk û Swêdiyan tê da beşdar bûn.

Sekıterê Gışti a Partiya me Heval Kemal Burkay, dı gotara xwe yê Kurdi da lı ser pırsên dınyayê û welat sekıni, mana û gıringiya 10 saliya partiyê eşkere kır.

Heval Burkay lı ser gıringiya pırsa aşıtiyê sekıni û gazi gelê mê kır ku dıji siyaseta êrişker û şerxwaz ya imperyaliya Devletên Yekbûyi ya Amêrika, NATO û Cunta Faşi bı xurti derkeve.

Heval Burkay got, tevgera rızgarixwaz a Kurdıstanê iro belavbûyi ye û dı nav gelek xeletiyan da ya. Hêzên welatparêz eger dıxwazın roja serketınê binın nêz, dıvê jı van xeletiyan xwe xılaskın. Bona vê yekê, ji, dıvê ew, beri hertışti baweriya xwe bı hêza gelê me binın, wê rêz bıkın, yekıtiya hêzên welatparêz pêk binın û dost û dıjmın jı hev baş cuda bıkın.

Heval Burkay got, Cunta Faşi, pışti çar salên zordesti û zılmê, jı gel ra, jı bırçıti û betaliya fıreh bêtır tıştek ne ani; xelk jê sar bû, û Cunta êdi dırıze, dıhelise. Bona ruxandına Cunta Faşi rojki berê, dıvê em gırani bıdın karê yekıtiya hêzên dıji faşiyê.

Heval Kemal Burkay, lı ser propaganda Cuntayê sekıni ku ew dıbêje mın tevgera şoreşgeri û welatparêzi pelıxand, dawiya wê ani. Û hın kes ji sıst bûne, dı bın tesira vê propagandê da mane û bêhêvibûnê belav dıkın. Heval Burkay lı ser vê meselê usa got:

"Cunta derewan dıke. Heya ku gelê Kurd û Tırk hebe, Cunta nıkare dawiya tevgera şoreşger û welatparêz bine .Iro hın kesên çep ji weki gotınên Cunta rast dıbinın û bı zımanê wê qısedıkın, dıbêjın ' jı hêzên çep tıştek nema' ! Ev şaşiyek mezın e, bêhêvibûn e. Belê, iro lı welat rê-olaxên têkoşinê gora berê teng e, rewş çetın e. Lê dıgel vê ji, disa xebat ne sekıni ye û nasekıne. Meselen Partiya me lı der û lı hundır welat, gora rewşa iroyini xebat dıke, çıqa jı dest tê. Ev cıvinên me, pirozkırana 10 Saliya Partiyê bı xwe şemarek û derbek mezın ın lı Cuntayê.

"Dı tevgera şoreşgeri da wek peşveçûn, şun da vekışin ji hene. Şoreşgeri ev e ku merıv dı demên teng da bêhêvi nebe bir û baweriya xwe wında neke û berxwe bıde. Em şoreşgerên bı bir û baweriyên xurt ın. Dı ferhenga me da bêhêvibûn tune!

"Em mıstek merıv bûn wexta 10 sal berê bı rê ketın. Nuha em bı sedan, bı hezaran, bı dehhezaran ın. Tu quwetek nıkare dawiya tekoşina şoreşgeri û welatparêzi bine lı Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê."

Cıvina Stokholmê gora imkanên heval û hogırên me yê Swêdê hatıbû hazırkırın. Bı rêz û bı şahi derbas bû. Lı dorali salonê sûretên hevalên me yên ku jiyana xwe dı şerê rızgariyê û sosyalizmê da wındakırıbûn, lı ser caw mezınkıri hatıbûn dardakırın. Komıka kılaman (koro) û hozanên gelêr jı guhdaran ra marş û kılamên şoreşger û gelêr pêşkêş kırın. Def û zırnê lêxıst û komıkên govendê leyistıkên welat nışandan. Bı alikariya dia û şıêran, zordestiya kolonyali lı ser gelê me û xebat û tekoşina partiyê cardın hat eşkerekırın.

Ev herdu cıvinên me ji, dı dawiya sala 10'da bı serfırazi û bı xurti derbas bûn dı saya xebateke jir, rêz û kollektif a endam û dostên Partiyê. Ev cıvin bı rasti ji derbeke mezın ın jı bo Cuntaya Faşi û hemû dıjmınên gel. 10 Saliya Partiya me bû nişanek dın jı bo berdewamiya têkoşina gelê me, jiri û çalakiya Partiyê û bılındbûna hêz û êtıbara wê.

## DAXUYANİ
(Destpêk Rûpel 11 an da)

naruxe naçe û dêmoqrati ji bo xwe nayê welat. Bona vê yekê, dıvê yekıtiya hêzên dêmoqrat pêk bê û gel bıkeve têkoşinek xurt.

Bona vê yekê, Partiyên me bıryar dan ku hêzên xwe bıgihının hev ku bıkarıbın hukma faşi rojki berê jı ser kar bavêjın, dêmoqratiyê binın, daxwazên zûtırin ên pıraniya gel bı ci binın û jı gelên me ra riya rızgariya netewi û cıvaki vekın.

Xebatkarên Kurd û Tırk, hemû hêzên aşıtixwaz û dêmoqrat!

YEKİTİYA ÇEP gazi hemû kesan dıke ku jı faşiyê ne razi ne, bo yekıti û tekoşinê.

Werın em yekbın, da ku bıkarıbın faşiyê bıruxinın welat jı perişaniya abori, jı leyistıkên bı xeter û gelên me jı ewqas derd û xızaniyê rızgar bıkın!

Partiya Pêşeng a Karkeri Kurdıstan
Partiya Karkeran a Tırkiyê
Partiya Ked a Komunist Tırkiye
Partiya Komunist a Tırkiyê
Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê
Partiya Karker a Sosyalist-Tırkiyê

## MESAJA TKP
(Destpêk Rûpel 8 an da)

Em iro ji bawer ın ku gihıştına rızgariyê bı şerê mıştêrek yê gelên xebatkarên Tırk û Kurd va gırêdayi ye.

Hevalno,

TKP qimetek bılınd dıde têkoşina partiya we ku ew jı roja ewıl vır da dıji zordestiya neteweyi û cıvaki lı ser gelê Kurd, bo tayinkırına qedera xwe bı serbesti, dıji dıjmınên gelên me yên mıştêrek imperyali û hevkarên wan, dıji diktatoriya faşi dımeşine. Em dıxwazın bir-baweriyên pıştgıriyê nişandın bo partiya we, ku wê, wek hemû partiyên şoreşger û tekoşer gelek şehid dane û xesar ditiye.

Partiya me qimetek bılınd dıde hevkariya şeş partiyên çep - ku partiyên me jı dı nav da ne- û hêzên çep yên dınê dı şerê dıji imperyaliyê û diktatoriya faşi dı dema irojini da. TKP, beri her tışti, bona yekıtiya hêzên çep kar û xebat dıke û wê bıke ji. Dı vê babetê da, dimına wekhevbûna bir- baweriyên herdu partiyan (ya me û we) pışta me qewim dıke.

Hevalên hêja,

Em, dı 10 saliya Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê da, dı tekoşina we yê bı zor û zehmet û her usa jı serbılınd da jı Partiya we ra û Komita Merkezi ya wê ra serketınên xurt dıxwazım.

Bıji tekoşina gelê Kurd bo azadiyê!

Bıji yekıtiya gelên Tırk û Kurd dı şerê dıji imperyaliyê, faşiyê û şovıniyê da.

Partiya Komunist a Tırkiyê
Komita Merkezi
Sekıterê Gışti
Haydar Kutlu

www.arsivakurd.org

# CİGERXWİN DI DIL, TEVGER Û ÇANDA GELÊ ME DA WÊ HER BIJİ

Hozanê gelê me yê welatparêzi mezın, Cigerxwin, dı roja 22'yê Çıriya Pêşin (oktobır) ber bı sıbê saet sısêyan da, lı Stockholmê çû ser heqiyê xwe. Xeber lı der û hundır welat zû hate bıhistın û hemû kesên welatparêz û pêşverû gelek berketın.

Jına wi, zaroken wi û heval û hogırên wi lı Stockholmê taxa Tensta'yê salonek gırtın bo taziya wi. Gelek kesên welatparêz û pêşverû ku mırına Seydayê Cigerxwin bıhistın, lı Swêdê û lı welatên dınê, hatın bo taziya wi. Salon pênc roja tıji bû. Rêxistınên welatparêz û pêşverû yên Kurd û Tırk eleqeyek baş nişandan.

Dı divareki salonê da sûreteki Seyda hatıbû mezınkırın û danin. Dı diwaran da disa şiêrên wi hatıbûn nivisandın.Û kıtêbên wi yê çapkıri hatıbûn nişandan. Gelek gul û kulilk hatıbû danin ku rêxistınan, kesên welatparêz û nas û dostên wi şandıbûn.


Dı van pênc rojan da lı ser jiyan û tekoşina Cigerxwin axaftın çêbûn, şiêrên wi hatın xwendın. Mêvanan bir û baweriyên xwe nıvisandın lı deftera bo biranina wi. Disa mesajên serxweşiyê hatın xwendın.

Heval hogırên Partiya me, jı roja ewıl, çawa xeber hat bıhistın hevalti û dostaniya xwe nişan dan bo malbata Cigerxwin û Partiya Demoqratên Peşverûyên Kurd lı Suri. (Seyda endamê Komita Merkeziya PDPKS û berpırsiyarê wê yê Ewrûpa bû.) Ser mırına Seyda, bo rêvebırına kar û bar, komiteyek hat sazkırın û hevalên me tê da cihgırtın, çı jı dest wan hat, kırın.

Komita Merkeziya Paritya me mesaja serxweşiyê şand bo malbata Cigerxwin û PDPKS. Sekrıterê Partiya me Heval Kemal Burkay dı cıvinêda qısekır lı ser jiyan û tekoşina Cigerxwin. Wi gelek rûçıkên Seyda yên bılınd wek jiri, fıdakari, bawermendi û nefspıçûki nişan da û got dıvê ew jı mera bıbın misalên baş, rê nişan bıdın. Wi nişan da çawa Seyda xwe jı nuhve dıkır û pêş va dıbır, çawa wi welatparêzi û internasyonali xweş lı hev kelandıbû. Heval Burkay got, merıvên wek Cigerxwin nemır ın, û ew dı dıl, tekoşin û çanda gelê me da wê her bıji.

Wezirê karê macûran(mıhacıran) yê Swêd, Anita Gradin ji hat salonê, jı malbata Cigerxwin û jı gelê Kurd ra serxweşi xwest, bı kurti qısekır lı ser hêjayiya Cigerxwin wek hozanek welatparêz bo gelê Kurd.

Seyda wesiyet kırıbû ku, pıştı mırına wi, ew lı Sûriyê lı bajarê Qamişli nav Kurdan da bê defınkırın. Pıştı ku



kar û barê bo şandınê temam bû, dı roja 2'yê Çıriya Paşin da cendegê Seyda bı tayarê hat şandın Suriyê. Dı roja şandınê da lı Stockholmê disa cıvinek çêbû û gelek kesên welatparêz dı cıvinê da beşdar bûn.

Seyda dı 5'ê mehê da roja duşemiyê, baxçeyê malê da dan axê. Beri hatınê Swed dı vê malê da rûdınıştı.

Roja ku ew anin Qamişloyê, jı Hesiçe heya Qamişlo trampêl bı dû hev bûn. Roja ku ew dan axê lı dora 100 hezar merıv kombû. Kurdan mêr-jın û zarok, jı çarali welat, jı Cızir, Çiyaye Kurd, Şam û Heleb hatın, kombûn. Ewana jı Seydayê xwe ra, jı şairê welatparêzi mezın ra hurmeta xwe, dılgermiya xwe nişan dıdan. Tevi wan Ereb, Aşur û Ermen'ên dost û pêşverû ji dı cıvinê da hebûn. Qamişloyê heya wê rojê cıvinek usa ne diti bû.

Dı civinê da sekrıterê PDPKS Hemid Derwêş û endamê Politburoya Partiya Komunist a Iraqê Kerim Ehmed dı derheqa jiyan û tekoşina Seyda da qısekırın.

Me Cigerxwin da axê. Lê tıştê ku ew kırıbû "Cigerxwin"ne cendegê wi bû. Cigerxwin jiyanek tekoşer bû, şiêr bû, bir û baweriyek xurt bû. Şiêrên wi, bir-baweriyên wi û tekoşina wi tucar namıre. Ewê bı kar- xebat û tekoşina gelê Kurd wê her bıjin. Cigerxwin tım dı dılê me da be, bira me da be, çanda me da be.

## MESAJA PSKT JI PDPKS

Parti Dêmoqrati Pêşverû yên Kurd lı Sûri

Hevalên Delal,

Bı wındakırına Cigerxwin, endamê Komita Merkezi yê we, Şaır û welatparêzè Kurd ê bı nav û deng, dılê me gelek dışewıte.

Cigerxwin, emrê xwe da bo azadi û rızgariya mıletê Kurd. Wi bo rojên delal bê westan şerkır, dıji kolıdaran, dıji imperyalist û kevneperestan.

Şiêrên wê bûn dengek bılınd, çekek hêja dı nav gelê me da. Bir û baweriyên welatparêzi avdan, xurt û pêtkırın. Seydayê mezın rojên azadi bı çavên xwe ne ditın lê hatına wan rojan da para wi wê ne kêm be.

Seydayê Cigerxwin heya roja mırınê bı camêri şerkır. Ew dı heyştê sali da wek xorteki bû jindar, bawermend, xebatkar. Ew dı cıvin û meşinan da bı me ra bû.

Merıvên usa nemır ın. Ew her bıji dı dıl û çanda mıletê Kurd da. Ew tım wê bıbe mıskaleki baş dı şerê me da, rê şani me bıke.

Serê we sax be, serê mıletê Kurd sax be.

Komita Merkezi
Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê

www.arsivakurd.org